PolitikART

KOVARA MEHANE YA WÊJE HUNER Û RAMANÊ

09 Kanûn 2023 Şemî

HEJMAR : 323

## Newa û Nefesa Şoreşekê:

# KOMA BERXWEDAN



Wênê: Hogir Ar



Muzîkjen 2´yê tebaxa 2023´yan li Lalişa Nûranî ya li Şêxanê, ji bo ayînan li amûrên xwe dixin. Safin HAMID / AFP

# Nivîsa edîtor

Muzîk, di têkoşînên milletan a ji bo azadî û rizgariyê de her tim bûye mezintirîn amûrê motîvasyonê. Lê belê dîtina muzîkê bes wekî amûrê motîvasyonê mezintirîn xefka giştî ye. Wekî hunerên din hemûyan, muzîk jî yek ji kargêrtirîn amûrên polîtîk yên wan millet û civakan e ku li felata xwe digerin. Bindest, bi rêya muzîkê li aliyekî daxwazên xwe yên civakî, arezû û dîroka xwe vediguhezînin nifşên nû, li alîyê din jî karakter û taybetmendiyên bingehîn ên têkoşînê diyar dikin. Koma Berxwedanê jî di têkoşîna rizgariyê ya milletê Kurd de xwe da ber mîsyoneke wiha. Dema mirov behsa muzîka şoreşgerî û propagandayî bike, li ser navê muzîka Kurdî, bêguman serê pêşî, Koma Berxwedan tê. Helbet wê huner, rêûresmên muzîka Kurdî jî îcra kir, parast û bi pêş ve jî bir. Her çiqas di van salên dawî de sewta wan neyê bihîstin jî berhemên komê li dû xwe hiştî, hîna jî hestên şoreşgerî yên pirraniya civakê têr dikin. Koma Berxwedan ji bo muzîka Kurdî di nav çarçoveyeke dîrokî de teqabulî serdemekê dike. Serdemeke ku ji bo milletê Kurd têra xwe dijwar e. Lê ew di vê qonaxê de, di vê serdemê de asê nema û hêza xwe ya ragihandinî ew qas xurt emilandiye ku ji her deriz diçizire û tesîrê li me dike. Ango hêj jî dema ruhê me ditengije em berê xwe didin Koma Berxwedanê. Ew hîna jî xwediyê vê valahiyê ye. Em, ew ciwanên ku ‘emrê me bi qasî emrê Koma Berxwedanê ye, me hewl da careke din vê serdemê bi bîra civakê bixin da ku Koma Berxwedan jî em jî ‘emirdirêjtir bin di vê têkoşînê de.



Kurd li Enqerê 27 Çileyê 2015´an rizgarkirina Kobanê pîroz dikin. Adem ALTAN / AFP

**Herausgeber:** *Medya Presse-und Werbeagentur GmbH* Hans-Böckler-Str. 16 63263 Neu-Isenburg **Geschäftsführer:** Ahmet Yücedağ **Ver. Redakteur:** Roger Turaut politikart@yeniozgurpolitika.org

# Du qonaxên muzîka polîtîk a Kurdî

Darîn DOSKÎ

Hereketa Siyasî ya Kurdî, di salên 1970 û 1980'yî de li Tirkiye, Kurdistan û Ewrûpayê hêdî hêdî xwe bi rêk dixist. Di van salan de îmkan û amûrên Hereketa Siyasî ya Kurdî pir sînordar bûn ku xwe pê îfade bike û xwe bigehîne cemawer û girseya xwe. Televîzyon, radyo û rojnameyên Hereketa Kurdî tunebûn. Ji ber hindê, wekî amûreke propagandayê muzîk bûbû yek ji rê û rêbazên herî giring û tesîrdar. Hereketa Kurdî bi wesîleya muzîkê peyam û mesajên xwe rasterast digihandine girseyên xwe û rê li ber geşbûna hestên netewî xweş dikir. Ji salên 1980'yî ve, yek ji temsîlkarên herî giring bêguman Koma Berxwedan e. Bi stran û sirûdên xwe yên hêj jî popûler Koma Berxwedan xwe digihande wan cih û warên ku têkoşîna Hereketa Kurdî nedikarî xwe bigehînê yan jî li wan deran kêm dima. Hereketa Kurdî di heman demê de bi pêşengiya Koma Berxwedanê bizav û hereketeke hunerî jî da destpêkirin û bi vî awayî xwe gihande hemî quncikên Kurdistanê. Bi gotineke din, Koma Berxwedanê mizgîniya serdemeke nû dida ku Hereketa Kurdî hişyar dibe û bîr û hişmendiya netewî ya Kurdan hêdî hêdî di nav girseyan de belav dibe.

Çawa ku Hereketa Kurdî ku îdeolojiyeke nû û gotareke nû ya siyasî peşve dibir, ev yek ji bo Koma Berxwedanê jî di maneya muzîkal de teqabilî pêşvebirina şêwaz û zimanekî nû yê muzîkal dikir. Ji ber vê yekê zimanê muzîkal ê Koma Berxwedanê bi awayekî bivênevê xwe adapteyî vê îdeolojî û gotarê dikir.

## Mecbûrî afirandinê bûn

Ji dawiya salên 1980'yî heta serê salên 2000'î li bajarên Kurdan şer û pevçûneke tund hebû û gundên Kurdan dihatin şewitandin û valakirin. Qismeke zêde ya nifûsa Kurdan ber bi metropolên Tirkiyeyê ve yan jî di serî de Ewrûpa, ber bi welatên dî ve dihatine koçberkirin. Koma Berxwedan ji aliyê wan penaberan û koçberan ve hate avakirin ku avakarên komê mîrasa xwe ya kulturî, serpêhatîyên xwe yên şexsî û li gel tesîra Hereketa Kurdî veguherandine praktîka hunerî.


Ev praktîka hunerî ya ku Şivan Perwer salên 1970 û 1980'yî bi awayekî şexsî û serketî kirî, Koma Berxwedanê hewl da bi awayekî kollektîf bike. Armanc û motîvasyona Koma Berxwedanê ew bû ku hereketeke nû ya siyasî derêxe pêş û hestên netewî yên Kurdî xurt û geş bike. Ji vî aliyê xwe ve, ji gelek komên wekî xwe cûdatir, xwe da ber barekî giran. Koma Berxwedan bi vê mîsyon û barê xwe yê giran di demeke gelekî kurt de meşhûr bû û bi demê re hunermendên berketî û behremend afirandin. Her wiha gelek stran û sirûdên şahkar li kelepora muzîka Kurdî zêde kirin.

Şert û mercên giran ên salên 1980 û 1990'î yên ewil hemî muzîkjen mecbûrî afirandineke gelekî çalak dikir. Muzîkjenan xwe deyndarê gelê xwe û deyndarê têkoşîna netewî dizanîn û berhemên hunerî diafirandin û hewl didan piştevaniya Hereketa Kurdî bikin. Bi qasî îcrakirina muzîkê, piştevaniya Hereketa Kurdî jî giring bû û wan ev yek bi awayekî xwebexşane kirin. Van muzîkjen û hunermendan têra xwe berhem afirandin û çalak bûn. Esas, ji ber şert û mercên serdema xwe mecbûrî afirandinê bûn. Bi van kar û xebat û berhemên xwe tesîreke zêde li Kurdan kirin. Ji aliyê din ve ji ber ku şêwaz û dîskûrsa di muzîka wan da ji şer û pevçûnên salên 1980 û 1990'yî muteesîr bûye, zêdetir şêwaz û zimanekî propagandatîf hate bipêşvebirin.

**Hereketa Kurdî, bi pêşengiya Koma Berxwedanê bizav û hereketeke hunerî jî da destpêkirin û bi vî awayî xwe gihande hemî quncikên Kurdistanê. Bi gotineke din, Koma Berxwedanê mizgîniya serdemeke nû dida ku Hereketa Kurdî hişyar dibe û bîr û hişmendiya netewî ya Kurdan hêdî hêdî di nav girseyan de belav dibe.**

## Her album bi sedhezaran hat firotin

Di vê qonaxê de Koma Berxwedan li ser civaka Kurdan û guhdarên xwe fonksiyona katalîzorê pêk





Çawa ku Hereketa Kurdî ku îdeolojiyeke nû û gotareke nû ya siyasî peşve dibir, ev yek ji bo Koma Berxwedanê jî di maneya muzîkal de teqabilî pêşvebirina şêwaz û zimanekî nû yê muzîkal dikir. Ji ber vê yekê zimanê muzîkal ê Koma Berxwedanê bi awayekî bivênevê xwe adapteyî vê îdeolojî û gotarê dikir.

aniye yan ne, ku ev babeta minaqeşe û lêkolîneke din e, ji ber tesîra xebatên muzîkal (kaset û CD) yên endamên komê jî bêguman gihiştiye serketineke girseyî û cemawerî. Kasetên stranbêjên wekî Şehîd Sefkan, Şehîd Mizgîn, Xelîl Xemgîn, Diyar, Seyîdxan, Beser Şahîn, Hozan Serhat, Şemdîn, Zozan, Kawa û Hekîm Sefkan bi sed hezaran dihatin firohtin û ev kes hunermendên herî afirîner ên dema xwe bûn. Bi gotineke din Koma Berxwedan koroyeke mezin bû ku ji şexsiyetên meşhûr pêk dihat û her yek ji wan di dewra xwe de girseyeke guhdarên xwe hebûn. Hetta xebatên albûmên şexsî yên hindek endamên komê ji Koma Berxwedan navdartir dibûn

> Tevahiya vê liv û dînamîzmê atmosfera xwe ya çandî û bi taybet muzîka xwe afirand. Muzîka Hunergeha Welat bi şêwazeke nûxwaz tê afirandin ku -di serî de ciwan- xîtabî girseyên roja îro dike. Lê belê ev afirandina kulturî dîsa jî ava xwe ji kaniya têkoşana siyasî, yanî ji Şoreşa Rojava vedixwe û vê afirandinê bi giştî çoş û tesîreke mezin li ser milletê Kurd kir.

û zêdetir dihatine nasîn. Çunkî ber bi dawiya salên 1990'î ve û di destpêka salên 2000'î de komên muzîkê yên li seranserê cîhanê û pêkhateyên koral hêdî hêdî belav dibûn û xebatên şexsî yên muzîkê bêhtir derdiketin pêş. Ji ber vê yekê muzîka popûler a Kurdî, ji ber şert û mercên sosyo-polîtîk yên serdemê mecbûr dibû xwe adapteyî bazara muzîkê a cîhanê bike.

Di serê salên 2000'î de li gel xurtbûna Hereketa Kurdî, geşedanên teknolojîk û berbelavbûna înternetê ew şêwaza dîdaktîk a muzîkê hêdî hêdî kevn bû û êdî guhdarên xwe ji dest dan û kiryarên nû peyda nekirin. Her wiha mirov dikare bibêje ku civaka Kurdan ji vê şêweza muzîkê jî ter bûbû. Tercîh û daxwazên wan girseyên ku bi stran û sirûdeke Koma Berxwedanê diketine nav coş û heyecanekê, hêdî hêdî guherîn û meyl û meraqa wan girseyan ji bo şêweyên cûda yên muzîkê û dîskûrên sosyo-polîtîk ên serdema nû çêbû. Lewma di encama vê qonaxê de, tesîra muzîk û xebatên Koma Berxwedanê jî hêdî hêdî kêm bû. Esas, çawa ku şert û mercên polîtîk ên salen 1970 û 1980'yî Koma Berxwedan û muzîka wê afirand, bi heman awayî şert û mercên serdema nû jî ew himbêz nekirin û tesîra wan hêdî hêdî kêm kir.

Baş e, gelo em dikarin Hunergeha Welat wekî berdewama Koma Berxwedan pênase bikin ku di van salên dawî de wekî stêrkekê dibiriqe. Hunergeha Welat çima ewqas qîmet dît û çima ewqas derkete pêş û berbelav bû? Esas, guhdarên Koma Berxwedan û yên muzîka dîdaktîk û gelperwer a navend-ewrûpî ji vê şêwe muzîkê têr bûbûn. Lewma di afirandina muzîka polîtîk a Kurdî de lawaz bûbû û hejmara stran û berhemên ku çoş û peroşê bide girseyên mezin kêm bûn. Bi demê re di muzîka Kurdî de bêdengî û valahiyek pêk hat. Wekî her geşedanên civakî -ku huner, muzîk û edebiyata xwe diafirîne-, her guherîna civakî û siyasî ya hereketekê jî rê li ber guherîna muzîk û afirandinên kulturî vedike. Yanî geşedan û guherînên bizav û hereketên civakî û siyasî rasterast tesîrê li ser afirandinên kulturî jî dike. Liv û dînamîzma salên 1990'î çawa tesîr li ser muzîkê kiribe, bêdengiya îzafî ya salên 2000'î jî bi heman awayî tesîr li ser afirandina muzîkal kir.

### Pira di navbera Koma Berxwedan û Hunergeha Welat de

Di van deh salên dawî de li Rojavayê Kurdistanê geşedan û pêşveçûnên gelekî mezin pêk hatin ku temamê cîhanê şahidiya wan kir. Guherînên girseyî pêk hatin û di gelek waran da berxwedan çêbûn. Tevahiya vê liv û dînamîzmê atmosfera xwe ya çandî û bi taybet muzîka xwe afirand. Ev deh sal e em şahidiya afirandina muzîkekê dikin ku ev muzîk li ruhê serdema me tê. Her wiha muzîka Hunergeha Welat bi şêwazeke nûxwaz tê afirandin ku -di serî de ciwan- xîtabî girseyên roja îro dike. Lê belê ev afirandina çandî dîsa jî ava xwe ji kaniya têkoşana siyasî, yanî ji Şoreşa Rojava vedixwe û vê afirandinê bi giştî çoş û tesîreke mezin li ser milletê Kurd kir.

Ji aliyê din ve, hêjayî gotinê ye ku Hunergeha Welat li hember rewşên neyînî û zor û zehmetiyên li pêşiya Hereketa Kurdî karî mij û morana bêhêvîtî û reşbîniya Kurdan belav bike. Haya Hunergeha Welat û endamên wê ji vê tabloya reşbîn hebû û li gorî pêdiviyên Kurdan ev xebat û berhemên hunerî afirandin. Yek ji endamên Hunergeha Welat Delîl Mîrsaz di hevpeyvîna xwe ya ANHA'yê de dibêje:"Rojava, parçeyekî piçûk ê Kurdistanê ye, lê belê nisbet bi parçeyên din ji aliyê hunera şoreşger ve gelekî li pêşiya parçeyên din e. Ji salên 1980'yî heta roja îro bi sedan stranên şoreşê hatine çêkirin. Niha jî bi dengê hunermendên Kurd ên Rojavayî em hewl didin ji nû ve pêşkêş bikin û li gorî rewşa xelkê herêmê em stranên nû tomar dikin."

Hunergeha Welat ne tenê muzîka Kurdî, her wiha muzîka Ereb, Asûrî, Tirkmen û Çerkesên li Rojava jî tomar dike û bi bingeheke profesyonel a muzîkal van klîp û berhemên xwe pêşkêşî xizmeta xelkê dikin.

Xulase, haya Hunergeha Welat ji wê tesîr û karîgeriya Koma Berxwedanê ya berî bi salan hebû. Hunergeha Welat gehişte wê lûtkeya bilind ku îro bi rê û rêbazên nûxwaz, hevdem û afirînertir serkêşiya muzîka Kurdî ya popûler û polîtîk dike. Koma Berxwedan berî bi salan bi rêya kaset û CD'yan peyama xwe gihandibû guhdarên xwe. Îro jî Hunergeha Welat bi dîmen û dîtbariyeke serketî, bi têkeliya kostûm û dansên edetî û hevdem bi rêya klîpên sînematîk peyama xwe digehîne guhdarên xwe.




✯ Xebatên Koma Berxwedanê, sala 99'an jî têde, lê bi taybetî di salên 97-98'an de êdî gihiştin asteke têr û tijî. Piştî salên 92-93'an bi telîmata Rêber Apo, bi keda wî, li derveyî welat salê carekê konferanseke çandê pêk dihat ku ji her aliyê Kurdistan û cîhanê pisporên çand û hunerê, rewşenbîr, wêjekar beşdar dibûn. Di van konferansan de rewşa hunerê Kurdî dihat nîqaşkirin û encamên pir bibandor derdiketin.

# Xelîl Xemgîn: Koma Berxwedan berhema şoreşê bû

**Berrin UNSAL**

Huner carna hemû hêza xwe ji bo kesên ku ew kirine hedef bi kar tîne û di encama vê yekê de hebûna xwe li ser vê bingehê ava dike. Hemû gotinên xwe li dijî bêdengkirin, jinavbirin û "tunekirin"a li dijî xwe dibêje û hebûna xwe qahîmtir dike. Koma Berxwedan jî di jî vê tunekirinê, hebûn, huner, çand û muzîka netewa Kurd raxist ber çavan û şiyana parastina civaka xwe nîşan daye û heta demek dirêj jî ev erka xwe bi cih aniye. Di demên gelek zehmet de muzîkeke gelek serketî îcra kiriye. Wan tevî şexsîbûna xwe û avaniya populer ya civakê, îcrakirina hunera kolektîf berdewam kirine û di hişê milletê xwe de hunereke asokûr înşa kirine. Her wiha zimanê Kurdî ku giringtirîn hêmana hebûna milletê Kurd e bi muzîka xwe bi pêş xistine. Di dema avabûna xwe de bandoreke rasterast li ser jiyana gelek însanan kir û roleke mezin di warê çand û hunerê de lîstiye ku di têkoşîna milletê Kurd de li dijî kolonyalîzmê bivênevê ye. Me jî xwest em li ser vê komê careke din bifikirin ku di dîroka têkoşîna Milletê Kurd û Hereketa Kurdî de ciheke giring digire û niha tê paşguhkirin. Di vê çarçoveyê de me xwest em ligel Birêz Xelîl Xemgîn biaxivin ku yek ji kevintirîn endam û damezrînerê komê ye ku di vî warî de xwedî taybetmendiyeke dîrokî û arşîvî ye. Birêz Xemgîn, derbarê avabûn, mîsyon, motîvasyon û armanca komê de behsa gelek xalên giring kir ku mirov dikare demeke dirêj li ser biaxive û nîqaş bike. Hin tişt di gerdûna xwe ya sembolîk de bi hezaran gotinan rave bikin. Koma Berxwedan jî ji aliyê dîroka têkoşîna Hereketa Kurdî ve nîşaneya sembolîzmeke wiha ye.

**Fikra avakirina Koma Berxwedanê çawa peyda bû? Kom, di pêvajoyek çawa de û li ser çi esasan hate damezrandin?**

Şoreşa Kurdistanê dema di bin rêberiya PKKyê de bi rê ket, dixwest her beşeke civakê bixe hereketê û bi vê armancê biryara avakirina saziyeke çandî û hunerî da. Çinku şoreş bêyî xebata çand û hunerî nabe, çand û huner ji bo şoreşê bi qasî çapemenî û ragihandinê giring e. Ji bo beşên cuda yên civakê yên wekî karker, xwendekar û saziyên sivîl tevlî şoreşê bikin û wan bi rêxistin bikin hebûna saziyeke çandî hunerî lazim bû. Fikra esasî ji vir tê, bi gotineke din Koma Berxwedan projeyek bû. Hîn destpêka salên heştêyî de, Rêber Apo, giringiyeke mezin da çêkirina xebateke çand û hunerî. Heta sala 1983'yan, bi têkoşîna şoreşê û bi hewldanên me yên çand û hunerî me li diyasporayê bi navê Hunerkomê saziyek ava kir. Ji navê ewê jî aşkera ye, di bin banê Hunerkomê de komên muzîk, govend û şanoyê hatin avakirin. Li gelek welatên Ewrûpayê xebat kirin û çend şaxên saziyê li welatên wekî Swîsre, Fransa, Almanya û Îskandînavyayê hatin vekirin. Heyanî sala 1993'yan, ku Hunerkom di vê salê de hat girtin, li van şaxan gelek xebatên çand û hunerî hatin kirin.

Karên organîzekirina şevên şahiyê û festîvalan û beşdarbûna festîvalên biyaniyan hemû di bin banê saziyê de çêdibûn. Koma Berxwedan jî beşek ji Hunerkomê bû û beşa herî aktîf bû, kar û barê saziyê giş li ser milê wê bû. Ew komeke hevalan bû ku ji çend kesan pêk dihat. Em dora pênc şeş hevalan bûn, hin caran kêm dibûn hin caran zêde dibûn. Em xwedî roleke berfireh bûn ku me hem xebatên siyasî dikirin hem yên propagandayê hem jî yên hunerî. Her wiha ji bo xebatên rêxistinkirinê jî giring bû ku em biçin seredana şaxên xwe, perwerdeyên wan çêbikin, rê nîşanî wan bidin, bi wan re bikevin nav têkiliyê.

**Motîvasyon û mîsyona Koma Berxwedanê çi bû? Tevgerîna karê hunera Kurda li Ewrûpayê têkiliyek çawa bi Kurdistanê re datanî?**

Rojeva me şoreş bû, loma, dema me xebatên xwe dikirin, motîvasyona me ya sereke ew bû ku em êş û azarên gel dikişîne, rewşa şoreşê, zehmetiyên ku hene bînin ziman. Tevî ku em li derveyî welat bûn, bawer bikin bi ruhê xwe bi xebatên xwe em li ser axa welatê xwe bûn. Çinku dema tu nav rêxistinê de bî, karê te 24 saetan xebata civakî ye. Em tim xwe bi xwe bûn. Em li Ewrûpayê bûn lê em qet bi Ewrûpayiyan re nejiyan. Hemû têkiliyên me yên civakî di nav gelê me de bû. Loma vê biyanîbûnê wisa tesîreke mezin li me nekir. Berpirsiyariya me ew bû ku di vê serdemê de ku Kurd nû şiyar dibûn, gelê Kurd hebû lê xwedî li Kurdbûna xwe dernediket, em temsîliyetekê bikin ku rastiya wan bi wan bidin qebûlkirin. Her wiha dema name û helbestek ji gerîlayekî dihat, wisa heyecaneke mezin bi me re çêdikir. Nirxandinên Rêber Apo jî bi heman awayî bûn, çinku herî zêde ew bi vê xebata çand û hunerê re mijûl dibû. Van dikir ku bala me li ser rewşa şoreşê be, em bi ruh û can tê de bûn. Hevalên me ji kêleka me diçûn şehîd diketin, ev dibû motîvasyoneke mezin.

Lê derfetên şoreşê diyar bûn. Ji bo Koma Berxwedanê her kesek ji derekê bi dilxwazî hatibû, me nedikarî em lê mêze bikin ka xwedî şiyaneke hunerî ye yan na. Tenê me digot, tu dixwazî muzîkê bikî ha were stranan bêje. Lê piştre bi demê re hinek ji wan nekarîn dewam bikin, têrê nekirin, hinek ji wana derketin, lê yên herî jêhatî jî wek Şehîd Sefkan, Şehîd Mizgîn, Şehîd Newaf Haco û Şehîd Çiya keda wan gelekî di avakirina vê saziyê de hebû çûn û şehîd ketin.

**Hilbijattina sitranan, nivîsandina wan di nav pêvajoyeke çawa de pêk hat? Gelek sirûd û marşên Koma Berxwedanê hene, van sirûdan li ser civak û milletê Kurd mobîlîzasyoneke çawa dikir?**

Bêguman di her dem xwedî pêvajoyeke taybet bû, vê jî bandor li ser naveroka sirûd û stranên me dikir. Vê jî dikir ku gel berhemên me biecibîne û bi salan ji bîr neke. Stîlên ku me ava dikirin li gor rojevê şêwe digirtin. Bo nimûne strana Lê Amedê yek ji van e ku di 93'yan de dema serhildanan dest pê kir, em hevalên Koma Berxwedanê rûniştin û di nava saetek, diduyan de ew stran wisa hat çêkirin. Gelek bandor kir, piştre di serhildanan de di meşan de di her derî de, di her şahiyên milet da, ev tiştên me hilberandin ji aliyê gel ve hatin pêşwazîkirin û tim hatin dubarekirin. Helbet belkî me bi sedan stran çêkirine lê gelî ew ji bîr kirine, yan jî stranên ku tê de zêde giranî tune dihatin jibîrkirin.

Dema em Koma Berxwedanê di nav dema xwe de dinirxînin, em dibînin ku di nav civakê de kartêkirineke mezin li ser çêbûna hişmendiyeke antî-kolonyal çêkiriye. Bi taybet nivîsandina stranên biçoş ên derbarê Kurdan de yên ku behsa serhildan û têkoşîna wan dikin xwedî bandorên mezin in. Dema mirov ji vê çarçoveyê lê dinêre, hûn bandora muzîkê di warê dekolonyalîzm û antî-kolonyalîzmê de çawa dinirxînin?

Bêguman em hereketekî îdeolojîk in. Berî ku em dest bi vî karî bikin jî strana polîtîk di nava hunerê Kurdî de hebû û îro jî heye. Berê şerê eşîretan axa û began, serhildanên Kurdan hebûn ku ew jî polîtîk in û ew jî bûne stran. Hunermendên wek Mihemed Şêxo binavûdeng wan deman dikarîn di çarçoveya sîyasî û kurdewarî de, derheqê nasnameya kurdî û kurdbûnê da berheman çêbikin. Helbestvanên mîna Seydayê Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Yûsifê Berazî- Bêbuhar, Hejar, Pîremêrd û yên ji serdema klasîk wek Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran jî di vî warî de berhem anîne. Ew xwedî bandoreke dûr û dirêj in ku heta îro jî didome.

Lê stîla ku Koma Berxwedanê li ser navê strana siyasî ava kirî bêhtir li ser awayê propagandayê bû. Çinku em di pêvajoya avakirinê de bûn, me dixwest em xwe bigihînin hemî beşên civakê û behsa partiya xwe û armanc û bîrdoziya wê bikin. Loma aliyê me yê propagandayê girantir bû.

Bo nimûne di salekê de sê pîrozbahî hebûn, ango sê demsal hebûn. Çawa ku demsal xwe nû dikin, divê em jî tiştên nuh bikin; sirûd, stran, govend û şanoyê jî xwe li gor wê nû dikir. Me karên nîv-şanoyî, nîv-muzîkal ji bo Newroz, 15'ê Tebaxê û 27'ê Mijarê dikirin. Her demsal wekî hemleyekê bû, me tim xwe ji bo van hazir dikir, kar û xebatên me ji bo van bûn. Her heyvekê şehîdên xwe hene, em difikirin ka em ji bo şehîdan çi bikin. Terza Koma Berxwedanê bi temamî bi rojev û rewşa şoreşê ve girêdayî bû. Belku bi awayekî pir amator dihatin pêşkêşkirin, belkî derfetên me kêm bûn, lê van bandoreke mezin li ser gel çêdikirin.

Muzîk û hunera li dijî kolonyalîzmê ew e ku tu bi rihê berxwedanê li hember wê rabî, dijminî red bikî û li nirxên xwe xwedî derkevî; ango ev meydanxwestin e. Mesela me tenê tiştên dilşewat nedigotin, me digot ka em çawa dikarin bi stran û hunera xwe li hember kolonyalîzmê şer bikin. Me nîqaşa vê dikir û di encama van nîqaşan de me ji van guftûgoyan berhem çêdikirin. Û wek min gotî em di nav şerekî de bûn û me bi van derfetan, di nav şertên pir dijwar de xebatên xwe dibirin serî.

**Dema em berê dinêrin em dibînin ku piraniya komên muzîkê, hem ji aliyê hunerî ve hem jî ji aliyê muzîkolojiyê ve tevî şert û mercên zehmet, muzîkeke serketî hilberandine û ligel vê yekê ji aliyê polîtîk ve hişmendiyeke polîtîk li ba civakê çêkirine. Bi nêrîna we çi guherî ku muzîka kurdî ev taybetîya xwe ya çêkirina muzîkeke polîtîk ji dest da?**

Belê, çanda keyfê bi pêş ket, em wisa bi nav dikin. Lê ez dixwazim hinekî behsa pêvajoya dîrokî ya vê yekê bikim. Ji bo me, ji bo gelê Kurd û şoreşa Kurdistanê komploya navtewî derbeyeke gelek mezin bû, ne hêsan bû. Piştî esareta Rêber Apo bêguman me derbe xwar. Çinku wî di vî warî de jî rêbertiya me dikir. Rêber Apo di 98'an de li Îtalyayê bû û çend caran em hişyar kirin. Israr kir û got heger hûn guhertinekê nekin, tiştekê lê zêde nekin hûn ê di cihê xwe de bisekinin. Çinku ev sazî gelek mezin bûye, giring e hûn guhertinekê çêbikin. Divê êdî Koma Berxwedan bibe dibistanek. Bibe koroyeke netewî ku her kes bikare lê stranan bêje. Çinku dinya tevahî hat guhertin, ne tenê em, diviya me jî bi wê guhertinê re hin tişt biguhertana. Em jî ketin nav hewldana vê yekê, lê razemeniyek bo vê çênebû. Belkî heta niha jî tim armanca me ew e lê me nekarî.

Dîlgirtina Rêber Apo bandoreke çawa li xebata me ya çand û hunerî kir, em hinekî behsa wê bikin. Heta sala 2000'î jî ji aliyê hunerî ve serdestî di destê me de bû. Bo nimûne Koma Berxwedanê ji bilî xebatên şexsî yên endamên xwe, yek yan du album çêdikirin. Vêca di kanala dewleta Tirk TRT'yê de bernameyeke muzîkê çêdibû ku stranên têda dihatin gotin bi piranî yên Koma me bûn ku wan dizîbûn û adapteyî muzîka Tirkî kiribûn. Ev hemû di arşîvan de hene hûn dikarin lê mêze bikin. Heta ku stranên me yên radîkal jî gotinên wan guherandin, lê rîtîm û muzîk seranser aîdî me bû. Loma ez dibêjim ji aliyê bandora hunerî ve serdestî li Kurdistanê di destê me de bû. Piştî du hezaran me ev serdestî winda kir, çinku me derbe xwar, saziyên me sist bûn, me serdestiya hin tiştan ji dest da. Di eniya me de êdî razemenî jî çênebû ku vê bandorê çêbike. Di demeke kurt de me bandoreke mezin kiribû, lê me hîn têra xwe negotibû. Çinku me ji bo nifşên dahatûyê terzek ava dikir lê me negihande wan.

Divê em vê fahm bikin, ji 2000'î bi şûn ve me nekarî em xwe nuh bikin. Lê dewletên dagirker, taybetî Tirkiyeyê piştî salên 2000'î sîstema dewletê jî tê de xwe nuh kir. Bi taybetî jî di şerê li dijî Kurdan da, dest avêtin çand, huner, hunermend û saziyên me. Li bakur û başûr gelek saziyên me hebûn, li başûr hinek êrîş çêbûn li ser hêzên Kurdî û saziyên me û heval Çiya li wir şehîd ket. Yanî di van êrîşên dewletan da, bawer dikim piştî 2004-5'an gelek saziyên me hatin valakirin û dewletê heval saziyên me kêşan aliyê xwe. Gelek hunermendên me yên jêhatî ku karên sînamegerî, şanogerî û stranbêjiyê dikirin kişandin birin cem xwe. Bi ser de bi zimanê Kurdî televîzyon ava kirin û li wir em wek terorîst, dijmin û eşqiya bi nav dikirin. Vêca êdî ev tişt bi Kurdî gotin. Yanî ev rastiyek e heta niha jî hin kesên ku xizmeta dijmin dikin hene.

> ✭ Rojeva me şoreş bû, loma, dema me xebatên xwe dikirin, motîvasyona me ya sereke ew bû ku em êş û azarên gel dikişîne, rewşa şoreşê, zehmetiyên ku hene bînin ziman. Tevî ku em li derveyî welat bûn, bawer bikin bi ruhê xwe bi xebatên xwe em li ser axa welatê xwe bûn.

Axir ev giş bûn sebeb ku di nava gel de bi guherîna dinyayê ra meyleke dijîtal çêbe. Ji salên 2000'î û bi şûn ve pêlên postmodern û kapîtalîst her ku çû bandoreke zêdetir li ser civakê kirin. Em wek civakeke bêdewlet, ne xwedî zagonên fermî bûn, loma parastina civakê ji her alî ve pir zehmet bû. Welatên Ewrûpayê, dema ku înternet û karûbarên dijîtal derketin û belav bûn, wan li gor berjewendiyên xwe û parastina civaka xwe ji xwe re hinek qanûn derxistin. Me tiştekî wisa jî tune bû û xwestin bi dagirkirinê her tişta aîdî çanda me xira û talan bikin. Rêber Apo ji bo vê yekê dibêje qirqirina çandê. Di vê qirkirina çandê de bi taybetî ji 2007'an û bi şûn ve dewletên dagirker bi pêş ketin, hinek mewzî bi dest xistin. Dewletan herî bêtir çanda kêfê bi pêş xist, hunermend teşwîqî vê yekê kirin û vê jî naveroka hunerê vala kir.

**Wexta ku muzîk ji wan sînorên mekanî yên ku wê ava dikin, dûr dikeve û dema ku muzîk sînorên din ji bo xwe dike mekan, bi ya te ziman di nav wî mekanî de naşibe kirasekî nelihevhatî? Di vê kontekstê de, wexta tu li ser peywendiya sirgûn, muzîk û mekanî difikirî, tu vê babetê çawa dinirxînî?**

Bêguman, li derveyî welat bûn, ne wekî wê ye ku mirov di nava gelê xwe de be. Tu çîrokê bi xwe bijî, bi çavên xwe bibînî tişteke din e, tu jê dûr bî û wisa jê muteesîr bibî ew tiştekî din e. Lê muzîka me rastiyeke berçav e ku nîşan dide ka bûyerên li welat çiqas bandorên mezin li ser me kirine. Gelek hevalên me yên ku bi salan em hev du re dixebitîn, diçûn şehîd diketin. Koma Berxwedanê dîrokeke wisa heye. Her wiha me jî bandoreke mezin li ser xort û ciwanan dikir ku belkî bi sedan xort û ciwanî berê xwe dane welat û şehîd ketine. Em bi wan re jiyane, zehmetî me bi hev du re kişandiye, me bi hev du re kar û xebat kirine. Lê tu çiqas bêjî ne wekî wê ye ku mirov li ser axa xwe be, nav gelê xwe be, yanî hewayê welatê mirov jî bandora wê li ser dengê mirov heye, li ser neberata stranê heye, li ser her tiştekî heye, ev bênîqaş e. Lê me tim hewl dida, me digot erê em ne li welatê xwe ne lê em di nav civaka xwe de ne. Hemû kar û xebatên me di komele û saziyên me de pêk dihatin, jiyana me giş wisa derbas bû.

Bêguman xebatên kolektîf jî xebatên giring in, heta salên nodî hem kom mezin bû hem sazîya me û şaxên wê mezin û zêde bûn. Dema me pîrozbahî an jî konserên bi gel re çêdikirin, panzde bîst hezar însan kom dibûn. Mirov dikare bibêje partiyên herî mezin ên Ewrûpayê nedikarîn evqas însanî kom bikin. Lê me dikarî. Ev jî dibû motîvasyoneke mezin, tu dengê xwe digihînî gel. Serdema propagandayê serdema avakirinê bû. Ew serdemên avakirinê pir taybetiyên cuda hene. Tu nû ava dikî, kelecana wê gelek mezin e, zehmetiyên wê gelek mezin in, endamên te gelekî kêm in, bi tişta ku te heye tu dimeşînî.



**Şeva Bibîranîna Şehîdên Koma Berxwedanê: Şehîd Sefkan**



Endamên
Koma Berxwedanê

**Niha em li repertuara muzîkal a Koma Berxwedanê binêrin, gelo we dikarî aranje û orkestrayên hinekî din bi terzekî polîfonîk hilberînin? We dikarî înstrumanên hem ji rojava hem jî ji rojhilat bi kar bînin da ku hûn ji potansiyel û dewlemendiya wan sûd wergirin?**

Ez ji bo vê pirsê dixwazim kevanekê vekim, niha dema ku şoreşê em anîn li hev du civandin, pîvaneke hunermendiyê tine bû. Gelo Xelîl Xemgîn heqeten hunermend e yan na, dengê wî baş e yan xirab e, gel dê jê hez bike yan neke… Ji bo gel jî wisa bû, ev meşa şoreşê bû, me xwe wisa bi pêş dixist. Gel piştre biryara xwe dide ka kî baş e kî xirab. Ji taybetmendiya hunermendiyê zêdetir me berê xwe dida kurdbûna wan, me dixwest em modela hunermendên Kurd yên ku şoreşger û welatparêz bi pêş bixin. Ev giring e, em fêrî vê dibûn, ku em fêrî wê nebana me nedikarî em van berheman jî çêbikin. Çinku Koma Berxwedan berhema şoreşê ye. Me çiqas para xwe ji wan girtibe, ew jî ji berhemên ku me dane xuya ye.

Di meseleya orkestrayê de jî heger hûn li arşîvan binêrin hûn ê bibînin ku heta salên 92'yan jî em bi orkestrayan derdiketin ser dikê. Bi qasî orkestrayeke pêncî kesî em diciviyan. Em diçûn me muzîsyenên ewrûpî dianîn, me koroyên pirdeng çêdikirin. Me pê dîroka partiyê anî ziman, behsa şoreşê kir. Hingê derfet hebûn, bifikirin heta sala 92'yan me dikarî em orkestrayekê derxînin. Di salon û eywanên binavûdeng de bi awayekî girseyî em dihatin ba hev. Vê bala Ewrûpiyan jî gelek dikişand, lê niha em hatine 2023'yan, em pîrozbahî û sersalên partiyê li eywanên piçûk, heta li salonên daweta, bi înstrumanên biçûk ên wekî orgê yan jî yên elektronîk li dar dixin. Piştre sal derbas bûn, ev derfet êdî di destê me de neman. Ya din jî her ku çû ev aliyê kesayetî derket pêş, êdî her kes bi tena serê xwe bû hunermend, bi serê xwe karî ji xwe re tiştinan bike. Di xebata kolektîf de belkî pir kes ji me tam ne hunermend bûn, pir kes ji me jî di cihê xwe de sekinîn, xwe bi pêş nexistin. Belkî em bi xwe jî ji wan bin, yanî me xwe bi pêş nexist, me xwe negihande wê profîla hunermendiyê ya hunermendê biexlaq û bi her tiştê xwe ji bo civakê dixebite. Temam niyeta me çiqas baş be jî bila baş be, em hinekî di ciyê xwe de sekinîn. Me her tim xwe bi siyasetê ve girt, me aliyê xwe yê teorîk û hunerî paşguh kir. Loma em qels bûn û perspektîfeke xurt wekî ya Rêber Apo êdî tine bû.

Bêguman pêla populîzmê bandora xwe li ser xebata kolektîf kir, her ku çû ew zeîftir bû. Rêxistinbûyîna me jî kêm dibû roj bi roj. Piştî du hezarî şûnda, nêzîkahiya bo vê xebatê her çû hat guhertin, êdî razemenî bo vê yekê çênebûn. Belkî pir caran hewildan jî hatin dayin, lê çênebû.

> ✭ Stîla ku Koma Berxwedanê li ser navê strana siyasî ava kirî bêhtir li ser awayê propagandayê bû. Çinku em di pêvajoya avakirinê de bûn, me dixwest em xwe bigihînin hemî beşên civakê û behsa partiya xwe û armanc û bîrdoziya wê bikin. Loma aliyê me yê propagandayê girantir bû.

Niha em wek hevalên Koma Berxwedanê em hatin gihîştin astekê, hinek ji me çil salên xwe di vê xebatê de derbas kirin. Dema em hatin ketin nav vê xebatê em hîn ciwan bûn, di hunerê de dînamîka ciwaniyê pir muhîm e, lê niha her yek ji me şêst saliya xwe derbas kir. Performansa me, aliyê me yê fizikî her tiştê me bi awayekî xwezayî guherî. Bi kurtî dem diguhere û belkî tiştên hîn kûrtir çêdibin, lê ev rastiyek e, di hunerê de tim wisa ye, ji bo hemû dinyayê jî wisa ji bo me jî wisa bûye. Koma Berxwedan berî du sê salan gihişt astekê ku êdî endamên wê nekarîn bi hev du re bixebitin. Me xwest em vê komê dewrî jenerasyoneke nû bikin, wekî dibistanekê yan jî koroyeke netewî ku her kes lê fêrî hunerê bibe, lê me nekarî. Ev sê sal in xebatên Koma Berxwedanê rawestiyane, tevgereke nû jê re lazim e. Da ku bi ciwanên nû re bibe koroyeke netewî û dibistaneke hunerê li benda razemeniyekê ye, ev jî ne hêsan e.

# Ji dûriyê dengê Kurdistanê tê: Koma Berxwedan

Mehmûd DEMÎR

Li her derê dinyayê, ji ber zordariya serdestan gelên bindest mecbûr dimînin ji axa xwe derkevin û li welatên cuda bibin penaber. Bêguman jiyana penaberan ji her aliyê ve dijwar e. Pirsgirêkên wekî nijadperestî û kedxwariyê li wan welatan jî derdikevin pêşiya wan. Di wan şert û mercan de helbet parastina hebûn û nasnameyê karekî zor e. Lê belê, em dibînin ku gelê Kurd bi hêz û îradeya xwe, li her derê dinyayê dengê xwe bilind dike, têkoşîna xwe dide nasîn û xebatên xwe yên kurdewar didomîne. Koma Berxwedan jî yek ji wan mînakan e ku bi dehan hunermendên welatparêz li Ewropayê kom bûne û him ji bo parastin û pêşketina çand û hunera Kurdî, him jî ji bo danasîna tevgera azadiya gelê Kurd ked dane, bi dehan albûm amade kirin û dengê wan çil sal in hê jî di guhê me de ye. Stranên Koma Berxwedanê bi şêweyên cuda tehm û hestên cuda dide mirov. Di vê nivîsê de ez ê di bin sê babetên sereke de li ser stranên Koma Berxwedan hûr bibim.

### Bêhna Xaka Welêt

Hin stran hene ku dema li wan guhdar dikim, çavên xwe digirim û ew min tînin çiya û zozanên Kurdistanê. Di albûmên Koma Berxwedanê de gelek stranên bi vî rengî hene û ez dixwazim çend mînakan bidim. Ez ê bi "Oy Kurdistan"ê dest pê bikim, ji ber ku di vê strana kurt de em him rewşa Kurdistanê, him jî hesret, têkoşîn û hêviya gelê Kurd bi hev re dibînin:

*Pir salan man em bindest,*
*dijminê xwînxwar serdest*
*Oy Kurdistan Kurdistan navê te çi şêrîn e,*
*dinya alem dizane em şer dikin ji bo te*
*Ji bo serxwebûna te, mezin bûye şerê me*
*Em ê dijmin derxînin, ji ser çiya û erdê te*

Stran û helbestên gelêrî ji bo parastina nasnameya gel roleke giring dilîzin. Ji ber vê serdest her tim êrişî wan dikin. Wekî mînak, gelek stranên Kurdî ji bo Tirkî hatine wergerandin û bi salan wekî stranên gelêrî yên Tirkî hatin nîşandan. Herwiha, stranên Kurdî hatin qedexekirin û di dawet û şahiyan de jî dewletê nehişt ku gel stranên xwe bibêje. Li dijî vê zordariyê, Koma Berxwedanê di albûmên xwe de cih da gelek stranên gelêrî yên wekî "Baran Barî", "Zozan Zozan" û "Çoxê Mino" û bi saya vê yekê gelek stran hatin parastin, ji aliyê hunermendên cuda ve hatin gotin û gihiştin roja me. Li gel vê mîsyona xwe ya giring jî, ew bi gotin û awazên xwe me li gund û bajarên Kurdistanê digerînin.

Bêguman em nikarin di nivîsekê de behsa hemû stranan bikin, lê stranek heye ku naxwazim bêyî wê li ser vê mijarê biaxivim, ew jî "Gundîno Hawar" e. "Gundîno Hawar" him bi gotinên xwe him jî bi dengê efsûnî yê hunermend û şoreşgereke mezin Hozan Mizgîn bandoreke mezin li mirov dike. Dema şoreş û huner tên cem hev, bandoreke xurt tê afirandin. Hozan Mizgînê jî bi awayekî bêhempa, şoreş û hunera xwe anîbû cem hev. Straneke din a bi vî rengî jî "Ax Sebra Me Welat" e. Ev stran jî her tim hestên cuda dide min lê herî zêde hesreta welêt di dilê min de mezin dike:

*Tu tim dilxweş be, tu car te ji bîr nakim*
*Keç û xortên dîlan ji bo te şer dikin*
*Welatê min, canê min, ax sebra dilê min*

Di vê babetê de mînaka min a dawî "Bihar Xweş e" ye. Helbesta Cegerxwîn bi dengê Xelîl Xemgîn hesreta bêhna kulîlkên Kurdistanê nîşan dike. Bêguman Newroz û hatina biharê ji bo gelê Kurd xwedî wateyên kûr in. Ev stran jî ji bo biharê gaziyek e:

*Bihar xweş e çaxê gula, çaxê kulîlk û simbila*
*Newroz û sersala dila kengî bi xêr tu bê bihar?*




Stran û helbestên gelêrî ji bo parastina nasnameya gel roleke giring dilîzin. Koma Berxwedanê di albûmên xwe de cih da gelek stranên gelêrî yên wekî "Baran Barî", "Zozan Zozan" û "Çoxê Mino" û bi saya vê yekê gelek stran hatin parastin, ji aliyê hunermendên cuda ve hatin gotin û gihiştin roja me.

### Dengê Têkoşînê

Wekî min di destpêkê de gotiye, em dikarin armanca Koma Berxwedanê bi du nuqteyên sereke yên wekî pêşketina çand û hunera Kurdî û danasîna tevgera gelê Kurd pênase bikin. Ew di salên ewil ên tevgera azadiyê de hatibû damezrandin û stranên xwe wekî xebatên dîroka devkî, dîroka tevgera azadiyê qeyd dikirin. Em dikarin gelek mînakên wekî "28ê Adarê", "Xortên Kurdistan", "Partîzanê Me" û "Warê Me Ceng e" bidin. Di van stranan de him behsa berxwedana tevgera azadiyê tê kirin him jî ew gazî gelê Kurd dikin ku tevlî têkoşînê bibin. Hemûyan bi rîtm û gotinên xwe kelecaneke mezin afirandin, di şahiyên gel de cih girtin û hê jî bi heman kelecanê tên guhdarkirin. Li vir dixwazim mînakekê bidim ku dema navê Koma Berxwedanê dibihîzim cara ewil ew tê bîra min, ew jî "Lêxin Birano" ye. Ew helbesta Keremê Anqosî ye û Koma Berxwedanê bi dengê xwe ew kiriye efsaneyek:

*Lêxin birano lêxin*
*Ala sor bilind e*
*Kurdistana azad*
*Çi qas xweş û rind e*

Gelek hunermendên cuda di Koma Berxwedanê de xebitîn û ji ber vê yekê em di stranên Koma Berxwedanê de şêweyên cuda dibînin. Ev di berhemên wê de dewlemendiyekê diafirîne. Him di vê babetê de him jî di mijara şêweyên cuda de dixwazim "Şervan im" mînak bidim. Em di vê stranê de dengê Rotînda dibihîzin. Rotinda wekî hunermend û şoreşgerekî xwedî şêweyeke taybet e û di muzika Kurdî de bêguman xwedî cihekî taybet e. Ev stran jî him bi bikaranîna enstrûmanên cuda him jî bi terza Rotînda her tim coşeke mezin dide min.

Berxa min sond dixwim dema tu şehîd bikevî ez ê şînê nedim govendê bigrim,

Serê min bilind, dilê min xweş, ez ê bêjim keça min bû bûka welatê xwe

Di vê babetê de wekî mînaka dawî, dixwazim dîsa straneke bicoş û navdar "Lê Amedê" bidim. Amed bi dîroka xwe bêguman di dilê gelê Kurd de xwedî cihekî taybet e. Ev stran silavekê ji Amedê re dişîne û îro jî em li her qadê wê dibihîzin:

*Navê te pirr şêrîn e tu keleha berxwedanê*
*Paytexta Kurdistanê lê Amedê Amedê*

### Silaveke bi Kurdî ji bo cîhanê

Li gel stranên kurdewarî û li ser berxwedana gelê Kurd, em di stranên Koma Berxwedanê de rihê berxwedana enternasyonal jî dibînin. Bêguman ew bi xwezaya tevgera azadiya gelê Kurd re têkildar e. Em dikarin mînakên cuda yên wekî "Marşa Enternasyonal", "Stêrka Sor" û "Serfiraz Kin" bidin. Ew li hemû dinyayê bi zimanên cuda hatibûn wergerandin û bûbûn sirûda berxwedana gelên cuda. Koma Berxwedan jî li gel stranên wekî "Hey Şoreşgerên Kurdistan", "Ey Reqîb" û "Herne Pêş" cih dide stranên enternasyonal û ji şoregerên cîhanê re silavên tevgera azadiya gelê Kurd dişîne:

*Karistanan em in, li zeviyan em in*
*Em in jînê çêdikin*
*Ziman yek e ji bo me, dîn yek e ji bo me*
*Wekî ji dê û bavek hatin*

Strana "Kurd im, Dizanim Kurd im" li vir mînakeke gelekî baş e ku tê de em him hişmendî û nasnemaya netewî ya gelê Kurd, him jî berxwedanên gelên cîhanê dibînin. Bêguman piştgiriya enternasyonalîst îro jî ji bo gelê Kurd û gelên cîhanê hêviyeke mezin diafirîne. Ez dixwazim nivîsa xwe bi gotinên vê stranê bi dawî bikim:

*Bigihim Komara Kûba Guevara can bikim*
*Kurdistana Sosyalîst wek Vîetnam şîn bikim*
*Em ji wekî Vîetnam serbixwe ji bindestan*
*Divê bang bikim serbestî, bijî kurd û Kurdistan!*




# Mavênê Qom û Gelî de
# Têkêliya Zon û Hunerî

Şiyar MUNZUR

### Di cuya rojana de tesîra têkêlîya muzîk, zagon û zonî serê qom û miletî de

Gama ke ma ewro biewnê têkêlîya muzîk û zonî ra; têkêlîyê nê mewzûyan pratîkê cuya rojana de qom û miletî ser o bandoreka muhîm esta. Zon û zagon giredayê jumîni yê. Teyna kirmancîye de nê hemuya dîna de têde yel û qomî wazenê ke sarê xo zonê xo bizono, domonê xo eve zono xo bimusê û eve kulturê xo pîlîvê. Bingê hemuya kulturî û hunerî kî zon o. Na sevevi ra, qomo ke / mileto ke (je ma kirmancu) zono xo ci rê tomet a, bine kerdena asîmîlasyonî der o, kamiya xo yînkar bena, yî qomî rê zonê xo de muzîk virastene, kilamî vatene, qeseykerdene çiyede je merdene û maneyen o. Bingê kamiya herkesî, herqomî zon o. Biyayene û çînebiyayena ju kesi û qomî ki zonî ser o bîna bena. Eke ju zon çîne bî, wo kes û wo qom ki çîn o. Ewro ez vînenu ke sarê ma Kirmanc ferqê na zanayîşî der o. Dewleta tirkî dewrê cumuretî ra nata her roj kamiya kirmanciye tenena asîmîle kerda, wasto ke kirmanciye vînd bo, kirmancî tirk bê. Na cihet de Dewleta tirku xeyle kî ravêr şiye û sarê ma asîmîle kerdi. Hama niya dîme ke 40/50 sere ra jeder o sarê kirmanc heşiyora xo biyo. Naye ra 50 ser ra raver mektevune dersîmî de têde talevu vatênê ke ma tirk îme. Ewro sarê me dustê asîmîlasyonîde vejîno. Herhalde se-disey hunermendê ma estê ke têdeki jede eve zone xo / zonê ma kilamu virazenê û vanê. Eve hazaru, mîlyonun a kes na kilamu gos danê, pê zof qayîl benê û poştî danê na hunermendunê ma. Heşiyayena xoseriye kî xora na wa. Ma çixa ke jede zon qesey kerd, çixa ke jede eve zonê xo lawukî, kilamî gos dayî, honde xo nas keme beme eve xo.

### Mavênê cuya rojana û zagonî de apeyameyiyayişê dîyalekta kirdkî/kirmanckî goreyê dîyalekta kurmancî

Kirmanckî / zazakî zonêde kirmancun û kurdîstani yo. Tenê eve xeleşiyayena ju zonî nê zonê kurdî xeleşîno ne kî qomê kirmancî, sarê Kurdîstanî xeleşîno. Dewrê cumuretî, hardê kurdîstanî de taye cawu de qomê kirmancî ameyîve qirkerdene. Hem tertelê /qirkerdîsê Dersîm, hemi kî yê qirkerdîsê Şeyx Sayîdî heremunê ke teyî kirmanckî / zazakî qesey beno, wuza de virajiye û wuza ra têpiya kê na qirkerdîs eve asîmîlasyonê sipêyî ya berdevam kerdi. Herca de mektevî kerdî ra eve namê îlîm-bîlîm ardayene domenê kirmanckî / zazakî mektevu de tirkî musnayî. Na siyasetê asîmîlasyonî honakî kêmî nêbiyo devam keno. Tesîrê na asîmîlasyonî kî tabi hona miletê ma – qomê ma ser o esto.

Na sevevi ra û eve xeyle sevevune bînu ra kî kirmanckî / zazakî verva vîndîbiyayene der o. Gama ke ma ewro ewnenê derheqê dîyalekta kirmanckî de fikrêko wina asyeno: dîyalekta kirmanckî goreyê dîyalekta kurmancî hem cuya rojane de hem zî warê zagonî de apey yena. Hama fikrê mi gore kirmanckî / zazakî zonunê kurdîstanî ye bînu ra ne kemi yo, ne kî yîson besekeno vazo tenena senik çî virajîno. Tenê kî sarê ma yê kirmanc hardê welatî ser o axme wo. Je sarê ma ye kirdaş / kurmanc eve milonuna yîson telewede niyo. Na sevev ra kî zon taye cawu de jede qesey beno taye cawu de kî senik qesey beno.



Koma Berxwedane sewledayena royê hereketê azadiya Kurd ye huner û kulturi ya. Hem ronayena Koma Berxwedan hemi kî karo gure wo ke Koma Berxwedane virast aye ra kî rind vîneme ke Koma Berxwedan en virende vengdayîs û zirçayîsê sarê kirmancî ya Kurdistanî ya.

### Mavênê qomê kurdî de sembola netewî Koma Berxwedan, lebetnayiş û pawitişê xêza xo ya enternasyonalî û duştê netewî de serkewtişê xo?

Eve gorê mi, Koma Berxwedane mavênê qomê kurdî de sembola netewî û sewledayena royê hereketê azadiya kurd ye huner û kulturi ya. Hem ronayena Koma Berxwedan hemi kî karo gure wo ke Koma Berxwedane virast aye ra kî rind vîneme ke Koma Berxwedan en virende vengdayîs û zirçayîsê sarê kirmancî ya kurdîstanî ya.

Ronayîsiye Koma Berxwedane ra hata nika Koma Berxwedane eve têde zonunê kurdi huner virasto dez û wastena sarê kurdistanî arda ra zu. Eve kilam vatene, eve xoverdayene, caye xo mavenê hereketê azadîya kurdî de gureto. Serokê sarê Kurd, rayver Ocalanî ta gama virene ra eke Koma Berxwedane nêvero, wo waxt wastene û vatene ke her gure yê Koma Berxwedane de gereke têde zonê kurdî bivê. Her album de bive û her gurê de bive. No niyadayîs, verê ra nat felsefeya siyasetê hereketê azadiya kurd vî û hona kî heni yo.

### Mavênê Tevgera Azadiya Kurdî bi kirdkî de rol û payranêmayişa Koma Berxwedan

Di cuya rojane de fikrêko wina derheqê Koma Berxwedan de esto ke na komele sey koroyêka neteweyî nêşkawa pay ra vindera. Gorê mi, Koma Berxwedan pay ra wa. Yanê ma ke va ke, çayê pay ra nêvinete wo waxt honde hunermedî û hunero ke hermunê Koma Berxwedane ser o virajîyo hata ewro kî virajîno, eyî rê heqsijênî bena. Zerê Koma Berxwedane ra çewres - poncas kesî ra jede Hunermendê namdarî vejiyayî honakî mavênê qomê ma de caye xo girs o. Yîson gereke jê her çi, huner ki, gorê dewrê xo araze bikero. Naye ra 30 / 40 sere ra raver dewro de bînivî ewro dewrode bîn o. Neslê wo waxtî zovîna vî, ewro neslê na dewrî zovîna wo. Koma Berxwedan û hunermendunê Koma Berxwedane rolê xo ard ve hurendî. Na dewrê ewreyenî de kî hunermendê neweyî eve roye na dewrî ya Koma Berxwedanunê newî virazenê. Diyayîsê mi ra gore, belkiya eve usul û torê bîn ya hama roye Koma Berxwedan û roye hareketê azadiya kurdî, ewro kî virajîno, yeno meydan. Hatta tenena jede virajîno, jede axme biyo. Her cayê Kurdîstanî de ewro huner, kultur û musika kurdî virajinê. Peyniye de qesa kilme awa ke, dîna ju keşî rê, ju kome rê nêmanena, çiyo ke maneno, kar û hunere ke virasto a wo.

Cayê Koma Berxwedane ravêrşiyayena zonê kirmanckî / zazakî de zof muhîm o. Na gereke rind û rast bizoniyo. Naye ra 40 / 50 sere ra ravêr kilame kirmanckî / zazakî tek ju Koma Berxwedane de virajîjenê. Zonê kirmanckî/zazakî de nê hunermendî bî ( Sayîr û dengbejunê kanu ra qeyîr ) ne kî sayîrî, ya kî zovî çiyo bîn. Hatta wo suro, ma eke eve kirmanckî / zazakî kilam-lawuk vatenê, hereketê azadiya kurdî ra qeyîr, herketunê çep yê bînu têdîne ma ra vatenê nî dewa heremenî – miletenî kenê. Çixa rind ke û ez kî pê zof sa bonu ke ewro têde hereketî û komelî ye ke estê, hemuya yînu endî seveta kirmanckî qeseykerdene, huner virastene gureyenê. Zonê kirmanckî ravêr berdene, musnayene û musene ser o kar kenê. Na qiymet henî qolay niyameve worte. Binê na qiymetî de honde zof bedelî estê. Aynê, çutir ke ju qomo ke wayîrê zon û kulturê xo nêvejiya beno vîndî, henî kî ju qomo ke wayîrê bedelunê xo nêvejiya, aye ke bedel dê, yî xo vîr a kerdî wo qomi kî pay ra nêmaneno, beno vîndî. Na helmê Dîna de îlahî edelet çîn o hama gereke heqa teyr û tûrî, teyr û turî diyo, yê dar û berî dar û berî diyo û ye yîsono kî yîsonî diyo.

Eve selam û hurmet a…

# Koma Berxwedan
## û Xweziyên me yên wendabûyî!

Kakşar OREMAR

Dema navê Koma Berxwedan dibihîsim destpêka heza ji şoreşekê dikeve bîra min ku bi hatina wê re hêvîyên jiyaneke nû li ber çavên min zindî dibin. Bînin ber çavên xwe awayê jiyana nûciwanekî ku li Kurdistanê najî û hay ji rewşa siyasî-civakî ya welatê xwe nîne, lê dema dengê xweş yê çend hunermendan dibihîse rêbazeke nû ya jiyanê ji xwe re hildibijêre. Êdî pêre jî xwedî armancên siyasî-civakî ye. Ew deng û awaz weke bandora "ava heyatê" bû ku di havîneke germ de axa dewlemend a ku reh û rîşalên guleke têhnû hembêz kirine, av dide û ji mirinê xilas dike. Hez û evîna zarotiyê qedera jiyana paşerojê dide xuyakirin. Newayên ku me bi dengên ji nav Koma Berxwedanê dibihîstin mizgîniya şoreşeke dida me ku siyaseta dijminê înkarker vala derdixist. Ew stran û awazên nebihîstî, manîfestoya jiyana min û gelek kesên din dan diyarkirin. Ji ber ku em hînî dengê wan bûbûn û ji wan hînî gelek zanyariyên nû bûbûn, têhna me hingî dişikiya dema ku berhemekî nû belav dikirin. Ez heya hingî bi eşqa radyoyên Êrîvan, Bexda û Urmiyeyê dijiyam ku babê min bi me zarokên malê dida guhdarîkirin. Me bi stranên Koma Berxwedan, Şivan û Gulistan Perwerê zanî ka Kurdistana mezin çi ye û herî zêde Kurd li kî dera wê dijîn. Me zanî ka em ê çawa ji xewa giran a mirinê hişyar bibin û ka serhildan û berxwedan tên çi wateyê. Ji teva giringtir me zanî ku dema em li dora hev kom bibin dê ala Kurdistanê bilindtir û bihêztir biheje. Her peyva ku ji zimanê wan stranbêjan dihate bihîstin, navnîşana jiyaneke nû ya tije armanc ji me re dida diyarkirin.

### Hevalên ji bîr naçin

Wan salan xebatkarên doza Kurdistanê kêm bûn û carna jî dihatin mala me, lê dema yek ji wan dibû mêvan bi zanînên xwe yên kûr û dîrokî mirovî wisa hest dikir ku hemû Kurdistan bi xwe re aniye. Ew keç û xort bi exlaq û pirensîbên xwe yên bilind zû ketin nava dilê gel. Jîr, fîdakar, mutewazî û evîndarên xwendin, nivîsandin û zanînê bûn. Wan dizanî dê çi bikin û çi bêjin da ku guherîneke di feraseta gelî de çêbikin. Li gundan gundî, li bajaran bajarî, li civatan têr û tûrkê wan tijî, xwedî zanyariyên nû bûn. Vê rewşê liv û lebateke bihêztir xistibû nava jiyana civakê. Êdî hêvî mezintir bûn û ew şikestina şoreşa Barzanî di hestên xelkê de çêkiribû, dikewiya. Bêguman ev kesên ku wiha hêz didan me gerîla, şervan û şoreşgerên li serê çiyayên Kurdistanê bûn. Çantê wan li piştê û her dera ku diçûnê xelatên herî giranbûha, stranên Kurdî diyarî dikirin ku ji hêla dengxweşên bênavnîşan ve hatibûn gotin. Me nedizanî ew stranbêj kî ne, bergên kasetan pir sade bûn û derbarê wan da zanyariyên nivîskî gelekî kêm bûn. Ew tenê xwediyê dengê xweş bûn ku hêza xwe ya mezin didan diyarkirin. Ji min re xelata herî bihagiran kaseteke Koma Berxwedan û hunermendên din bû ku min bi sedan caran guhdarî kir. Gelek pirs diketin ber aqilê min, dîsa bersiva wan li cem wan hevalên hêja bûn. Silêman (Îmam Husên Bilgîn), Bedran, Mistefa, Yeqûb, Ehmed Aktaş, Sakîne, Rojîn, Fûad, Şehîd Sefkan û bi dehan kesên din ku heya roja îro jî şîret, daxwaz û rastiyên wan ji bîra min naçin.

Wê pêvajoyê di jiyana min de ne bi gotinên felsefî û giran, lê belkî bi awaz û helbestên wan dengên xweş dest pê kiribû ku tev ji me re dengên nû bûn. Bi rêya wan me Cegerxwîn, Dildar, Mihemed Şêxo û gelek kesên din nas kirin. Beriya wan dengê Eyaz Zaxoyî yê germ bi wan stranên wî yên tije peyamên veşartî û muhtacî analîzê bûn ku hêdî hêdî mejiyê min û sedan nûciwanên din leqandibû. Ew li ser kutirkujên Mehabad û Şêx Seîd distra û tim diqêriya: "Çi bikim ez?" Eşqa Kurdistanê wiha hêdî hêdî di dil û mejiyê min û hezaran kesên din de kemilî û êdî asoyên pêşerojeke tije hêz û hez û xwezî li ber piyê me da xuyanîkirin. Di vê rêyê de ku êdî zimanê me yê îtîrazê li dijî siyasetên dijmin tûjtir dikir, bi qedirnasiyeke mezin dikarim bêjim em gelek deyndar û minetdarê endamên Hunerkom û Koma Berxwedanê ne. Dema ku weke xwendevanekî di nava hevalên nas û nenas de rûniştinên me çêdibûn, bi rêya bihîstinê û piştre bi dîtina dîmenên wan, li rêya kasetan tim gotineke me ya nû hebû. Mêtîngerî çi ye, dagirker kî ne, asîmîlasyon tê çi wateyê; Dêrsim, Botan û Efrîn li ku derê ne, bakur ji kîjan aliyê Kurdistanê re tê gotin û... hwd. Tev ew mijar bûn ku ji me re nû bûn. Me bi rêya dengê wan hunermendan zanî ku êdî li Kurdistana mezin "pêvajoyeke nû" dest pêkiriye û erkên giran li ber me jî hene.




### Rista Koma Berxwedan û nameyeke biqedirzanînê

Sal derbas bûn û êdî peyamên nûtir jî hatin. Şerê çekdarî, HRK, Egîdê fermandar, ARGK, manîfestoya PKKyê û mizgîniyên wekî "Ji serxwebûn û azadiyê birûmetir tiştek nîne..." em ji rewşeke nû ya li welat haydar kirin. Her kar û kiryar dê li gor dema xwe bên nirxandin, pîvandin û analîzkirin. Ji me kesên çavgirtî re ew deng û peyvên ku ji zimanên wan bi ser mejiyên me de dibarîn, tev nû bûn. Rê û heza me ya ji bo Kurdistanê, naskirina zaravên Kurdî, erdnigarîya welat, hevgirtina Kurdan, daxwazên dîrokî û bi dehan tiştên din bi rêya hunera şoreşê bûn hesretên ku heya roja îro jî ji dilê me derneketine. PKKyê û rêberên wê baş dizanîn ku şoreşeke zanistî û Kurdistanî lazim e ku divê piralî be û şaxên wê dewlemend bin û ji hêla herkesî ve bêne dîtin. Ji ber wê jî em di nava Koma Berxwedanê de Kurdên ji çar aliyên welatê xwe dibînin. Ev di xana muzîk û hunera Kurdî ya protestoyê de jî destpêka pêvajoyeke nû bû ku îro êdî bûye xwendingeheke dewlemend û xwedî bandor li ser hemû çînên civaka me. Ew pêvajo ji salên 1980yî heya 1990î pir xweş meşiya û li rex şerê çekdarî û xebata siyasî bû hêzeke mezin a menewî-siyasî ku dijmin har û dîn kiribû. Dewlemendiya ziman û hunera Kurdî bi wan dida selmandin. Vê yekê bi serê xwe gelek destkeftiyên din afiradin ku ya herî girîng hatina keç û xortên dengxweş bû ku bi evîneke mezin berê xwe dabûn qada xebatên hunerî. Di nava berhemên wan keç û xortan de em pirî caran stran û sirûdên stranbêjên Koma Berxwedanê ji nû ve dibihîsin. Ev selmandina wê rastiyê ye ku ew hunera şoreşê di wan salên reş û bêdengiyê de li ser civakê xwedî bandoreke pir baş û erênî bûye. Gelo êdî di wan salan de ku tije şer û xwîn, berxwedan û serhildan bû, pêwîst nebû ku ew mîrateya dîrokî roja îro bêtir bê gotin û belavkirin? Ma ew nebûn ku hêza Kurdên Ewropa û Kurdistanê bi hev re girê dan û li dijî dijminê dagirker anîn qada xebatê?

Min xwest wekî qedirnasî û spasbêjiyekê girîzgaheke wiha bikim. Ne ku li gor derfet û îmkanên demê ji nava dil û hestên min derketin ku dîsa li vir dubare dikim: Di wan salan de ne ewqas radio hebûn ne teknîka ragehandinê bi hêz bû ne jî qêrîn û hewarên Kurdan dihatin bihîstin, lê keda Koma Berxwedan û bi taybetî hunermendên wê yên şehîd qet û qet ji bîra dîrokê naçe.

### Rexne û daxwaz!

Min berê jî li ser Koma Berxwedan rexne nivîsîne, wan dubare nakim û li vira amaje bi hinekên din dikim. Min di vê nivîsê de tenê 11 xalên rexneyî lê tije daxwaz raxistin ber çavan. Li ser vê mijarê rexne û nêrîn pir in, bes bila vê carê evqas bin û yên din bimînin bo derfeteke din û nivîseke dirêjtir:

◗ Çima vê koma şoreşgerî li pey wê bandora mezin û berhemên giranbûha karê xwe berdewam nekir? Çima niha Koma Berxwedan bûye Koma Bêxwedan? Kî bû an kî bûn sedema hilweşîna vê koma ku dengê şoreşa Kurdistanê bû û serdemekê digotin em ê bibin sefîrên hunera Kurdî ya şoreşgerî?! Min heya roja îro jî ji zimanê yek ji endamên wê komê bersiva xwe nebihîstiye!. Hinek kes bi awayekî dûr ji lojîkê dibêjin: "Di nava komê de her endamek bi serê xwe hunermendekî serbixwe bû. Hinek deng jî hev nagirin û li hev nayên. Ji ber wê jî me xwest em karekî nûtir bidin dest pêkirin...!" Gotinên wiha ji min û gelek kesên din re nabine bersiv. Ger deng li hev nedihatin we dikarî hûn stranbêjên amator ji nava komê derxînin û ciwanên deng xweş, perwerdekirî û bihêz bînin nava xwe?

● Eşqa Kurdistanê wiha hêdî hêdî di dil û mejiyê min û hezaran kesên din de kemilî û êdî asoyên pêşerojeke tije hêz û hez û xwezî li ber piyê me da xuyanîkirin. Di vê rêyê de ku êdî zimanê me yê îtîrazê li dijî siyasetên dijmin tûjtir dikir, bi qedirnasiyeke mezin dikarim bêjim em gelek deyndar û minetdarê endamên Hunerkom û Koma Berxwedanê ne.

◗ Dema kar bi hev re bê meşandin, hingî berhemên bihêz û dewlemendtir di nava xelkê de belav bikin. Hez û rêzdariya ji bo karê komî ji ya takekesî gelek zêdetir e. Gelo endamên komê di wan pêşwaziyên germ ên di şevên pîrozbahiyê de ku ji bo Newroz, 15ê Tebaxê û salvegera damezrandina PKKyê û hwd, dihatin lidarxistin bi wê rastiyê nehesiyabûn ka çima gel ji wan hez bike? Ger xwe ker û kor nekirana û qîmeta nêrînên gelê li dora xwe zanîbûna, wan qet û qet nedipejirand ku ew kom belav bibe. Siyasetmedar an kesên din jî ne xwediyê wê rayeyê ne ku li ser rêbaza wan hunermendan biryarê bidin ku ji wan zêdetir tên hezkirin.

◗ Di berhemên Koma Berxwedanê yên berê de em bihayê stranên bi zimanê Tirkî zêdetir ji yên bi zaraveyên Soranî, Kelhurî û Lûrî dibînin. Kızıl Güller Açınca, Hêzil Çayê û gelekên din mînakên wê yekê ne. Ger wan bi nêrîneke dûrbînane li dor hunera Kurdî ya xwedî şaxên rengîn lêkolîn bikirana bêguman dê him berhemên wan zêdetir bûna him jî hêza wan dê zêdetir bûya. Di nava sedan stranên wan de heta stranek jî bi Kelhurî, Lekî an jî Lûrî nayê bihîstin! Yên ku bi Soranî jî hatine gotin di warê ziman de tije kêmasî ne.

◗ Hinek berhemên ku di 16 kasetên komê de cih girtine wisa xweş û tije peyamên dîrokî û girîng in ku êdî dubare nabin: Hûr Hûr Lêxin Govendê, Gundê Me, Ax Kurdistan, Kurd im Dizanim Ez Kurd im, Lê Amedê, Îro Çerxa Şoreşê, Zara Giyan, Derdo Derdo, Gidî Lolo, Azade Şêrîn, Hey Botan, Arteşa Me Rabû, Dewleta Tirk li Dêrsimê, Şa Be Welatê Min Şa Be, Berfek Barî, Hoy Mamo, Ez Kurdistan im, Ey Welat û hinekên din vê rastiyê diselimînin ku karê kolektîf "hebûn û mayîna" keda mirovan direjtir dike. Gelo çima êdî berhemên wiha ji hêla Şemdîn, Xelîl Xemgîn, Zozan û yên din ve nayên afirandin?

◗ Koma Berxwedan berê xwedî plan û proje bû. Dema komê kasetek derdixist li ser kilamên klasîk, sirûdên netewî û hwd dinivîsî. Bi belavbûna wan û beşdariya dengbêjên weke Marûf qîmeta folklora Kurdî ji her çar alî ketibû nava xebatên komê. Em li benda berhemên din yên bi vî cûreyî bûn, lê êdî hew karekî nû hate bihîstin û kirin!

◗ Akademiya Koma Berxwedanê, xana muzîka Kurdî ya protestoyê bihêztir kir. Karekî wiha anku bi rêya strana protestoyî şerekî din jî li dijî dijmin hat dayîn. Ev ji hêla hunermendê navdar Şivan Perwer ve çêbû û hinek berhemên wî û Gulistan Perwerê jî hene ku programa hereketa bakurê Kurdistanê eşkere dikin û bi zimanê hunerê vedibêjin. "Deng û Basên Kudistan" yek ji wan kasetan bû ku xwedî bandoreke mezin bû! Mixabin salên piştre Şivan Perwer ji hereketê dûr ket lê di eniyeke din da karê xwe berdewam kir. Pêre jî Hunerkomê di sala 1983an de dest bi karê xwe kir û êdî hunera protestoyê derbasî pêvajoyeke bihêztir bû. Rûberê wê berfirehtir bû lê hê jî nebibûne xwediyê wê hêzê ku li her dera Kurdistanê bêne naskirin. Kêbirkiyeke mezin kete navbera wan û ev jî bi xêra şoreş û hunerê bû. Li vir pirsa sereke ev e: Çima zêde xwendevan di dibistana Koma Berxwedanê de nehatine pewerdekirin? Çima di komcivîn, konferans û kongireyan de nifşê nû û ciwanên dengxweş pirsên bêhejmar li berpirsên Komê dikin? Ji sala 1983an û şûnde çend "dengên nû" ketin nava komê? Ji rojhilat, Kurdên Xorasan û Kurdên başûr çend endamên nû hebûn?

◗ Pirî caran min bi hunermendên li derveyî Koma Berxwedanê re hevpeyvîn û hevdîtin pêk anîn ku bi gilî û gazin digotin: "Hinek endamên wê komê bûne rêgir ku em di karê xwe de pêş bikevin. Heta teklîfa me ya endamtiyê jî di nava xwe de red kirin. Di hemû helkeft û çalakiyên hunerî de tim singê xwe dane pêş û di ragehandinê de jî zêdetir rûyê xwe dane xuyanîkirin. Ne hevkarî dane me ne jî hiştin em jî dengê xwe bigihînin gel. Ew bi xêra ragehandina aliyekî siyasî nabe ku li dijî kesên din xwedî helwest bin. Em jî Kurd in û ji şoreşa Kurdistanê hez dikin. Sansûr li dijî me sepandin û îmkanên şoreşê tenê ji bo xwe bi kar anîn. Bi vî awayî bûne sedema bêdengî an jî paşdemayîna me." Cîhanbîniya hunermendên xwedî îdîayên şoreşgerî divê fireh û gerdûnî be. Xwezila ew mentalîteya nerast di xeta hunerî ya vê komê de nebûya. Em ê jî îro ne di vê rewşê da bûna.

● Çima vê koma şoreşgerî li pey wê bandora mezin û berhemên giranbûha karê xwe berdewam nekir? Çima niha Koma Berxwedan bûye Koma Bêxwedan? Kî bû an kî bûn sedema hilweşîna vê koma ku dengê şoreşa Kurdistanê bû û serdemekê digotin em ê bibin sefîrên hunera Kurdî ya şoreşgerî?!




● Rûdanên ku li Kurdistana dagirkirî diqewimin di salên berê de zêdetir bala Koma Berxwedanê dikişandin. Carna soz û awazên wan birînên di nava hestên xelkê de dikewandin, lê nêzî bîst salan e ku ne ji bo Berxwedana Kobanî ne ji bo fermana Şingalê ne jî ji bo şoreşa Jin Jiyan Azadî û gelek mijarên din em dengekî bihêz ji endamên komê nabihîzin.

◗ Rûdanên ku li Kurdistana dagirkirî diqewimin di salên berê de zêdetir bala Koma Berxwedanê dikişandin. Carna soz û awazên wan birînên di nava hestên xelkê de dikewandin, lê nêzî bîst salan e ku ne ji bo Berxwedana Kobanî ne ji bo fermana Şingalê ne jî ji bo şoreşa Jin Jiyan Azadî û gelek mijarên din em dengekî bihêz ji endamên komê nabihîzin. Ji xeynî hozan Diyar Dêrsimî ku bi dengê xwe yê şîrîn carna ji vê yekê re bûye bersiv, ewên din tim xwe dubare dikin. Hinek jî tenê wek endam xuya dikin lê kartêkirineke piçûk jî nekirine.

◗ Tevî ku teknolojiya ragehandinê pêş diket ew li cihê xwe diman, belkî paşda man û piraniya wan nekarî medya û torên civakî ji bo bilindkirina deng û hunera xwe bi kar bînin. Yanî di çarçoveyeke teng de him bêperspektîf man him jî gelek endamên wê nekarîn piştî belavbûna komê li ser piyên xwe bisekinin.

◗ Hinek endamên komê zêdetirî 40 salan e li Ewropayê ne, lê mixabin min hêşta konsereteke wan bi hunermendekî Almanî, Fransî an jî Îngilîz re nedîtiye. Gelo ger ew kom mabûya di pêşerojê de dê nekarîbûya pêngaveke wiha jî hilîne? Ev yek nedibû sedema zêdetir nasîna huner û pêre jî doza siyasî ya Kurdistanê?

◗ Di karê kolektîf de şêwr û hevkariya helbestvan û rewşenbîran dikarîbû asta kar û xebatên Koma Berxwedanê zêdetir bike. Lê komê weke kadroyên rêxistinekê, bi civînên xef biryarên xwe dan. Ev jî bû sedem ku asta wan ya rewşenbîrî kêm bimîne û pêş nekevin. Ji berê heya roja îro nehatiye dîtin ku cudatî di navbera hunermend û rewşenbîran de hebin. Ew her du jî mukemilên hev in, lê ger hûn baş bala xwe bidinê di hemû berhemên Koma Berxwedanê de helbesteke Ehmedê Xanî, Hacî Qadirê Koyî, Melayê Cizîrî û dehan şairên din yên Kurdistana mezin nayên dîtin. Ji wê zêdetir jî xwendina wan ya pirtûkên bi zimanên din gelek ji yên bi zimanê wan yê zikmakî zêdetir e. Em vê yekê di hevpeyvîn, nivîs û daxuyaniyên wan de dibînin.

# Xwezila bi wê rojê:

# Bibîranînên bi şehîd Sefkan re

Kakşar OREMAR

Hema behsa arşîvê tê kirin navê hunermendê şehîd Sefkan( Celal Ercan – 1960-1985) tê bîra min. Sal 1984 bû. Havîneke germ û ez ji Tebrêzê vegeriyabûm Urmiyê. Ji wir jî tevî çar hevalên xwe çûbûm herêma Mirgewerê. Çend hevalên PKK'ê li bajarokê Zêwe hebûn. Yek ji wana hevalê Ehmed [Ahmet Aktaş] bû ku niha li Elmanyayê ye û şoreşgerekî xwedî ked û şervanekî naskirî ye. Wan salan, ji ber sistbûna desthilata dewleta navendî, gelek partiyên siyasî li herêmê çalak bûn. Şerê HDK û dewleta Îranê germ bû. Dema ez û çend hevalên xwe çûn serdana wan, hevalê Ehmed daxwazeke wiha ji min kir: "Erebekê bigire û here gundê Rajanê. Hevalekî hunermend bi navê Sefkan ji Ewrûpayê hatiye. Wî bi xwe re bîne û werin vir". Bi bihîstina navê Sefkan, kela canê min rabû. Heya hingî min nedizanî ku hunermendên şoreşger jî di nava PKK'ê de hene û hatine Rojhilatê Kurdistanê jî. Ez çûm û ew gelek bi germî pêrgî min hat. Wî zêde ji Kurdiya min fêm nedikir, lê carna bi nivîsîn û heta bi kişandina wêneyekî şêwakariyê ez bi merema xwe dihesandim. Bejina wî bilind û reng-rûyê wî yê hunermendan bû. Dest avête saz û çentê xwe, em hatin Zêwe. Gotin û zaniyariyên wî hemû nû bûn. Rewşenbîr û têgihiştî bû. Min cara yekê ji wî bihîst ka rista dengbêjan çi ye, ew kî ne û di dîrokê de çi kirine.

Hingî li ser Ehmedê Xanî, Hesen Cizîrî, Eyşe Şan, Evdalê Zeynikê, Kawîs Axa û hinek navên din ji me re diaxivî ku me tenê pirr kêm nav û dengê wan bihîstibû. Dema behsa dengbêjan kir min jê re got: "Heval Sefkan babê min jî stranên dengbêjiyê dibêje". Girnijî û got: "Baş e ku tu li virayî, lê ka bêje dengbêjên din yên naskirî li herêma Urmiyê hene yan ne?" Min jê re got, "Ez zêde nizanim, lê were em sibe herin malê û tevî babê min biaxive, ew wana teva dinase..." Wî li hevalê Ehmed nêrî û bi Tirkî jê re got: "Ez ji bo hînbûna ziman û komkirina arşîvê hatime Rojhilatê Kurdistanê. Gere tu hevkariya min bikî ku ji derfetên hene, sûdeke mezin bistînim..."

Li ser daxwaza heval Ehmed, ez bi Sefkanê jîr û têhniyê zanînê re bi qasî du meh û 20 rojan bûm hevkar. Gund bi gund em geriyan, me li deriyê gelek malan da û me ew dengbêjên ku babê min navê wan dabû peydakirin. Ji ziman û dengê Bêmalê Rajanê, heta Ehmed Ehmedî, Sofî Elî û çend kesên din, sedan stranên dengbêjiyê hatin nivîsandin û tomarkirin. Carna ji bo kirîna kasetên xalî û defterên mezin pere tinebû. Wî biqasî çar defterên 200 rûpelî tije kirin. Wî ji xeynî strana di deftereke taybetî de jî gotinên pêşiya, metelok, zargotin û qesîdeyên olî jî dinivîsandin. Wê havînê, ez ji Sefkanê rewşenbîr hînî gelek dersên giranbûha bûm. Weke ku min zanîngeha çanda Kurdî bidawî kiribe. Ez hînî nivîsandin û xwendina Kurdiya Latînî kirim, lê bi mercekê ku ez jî wî hînî xwendin û nivîsandina bi pîtên Aramî bikim. Dersên ku hingî wî dane min, hêşta jî ji bîra min neçûne. Cara yekê bû ku em tev li dora wî kom dibûn û ew jî li ser du mijarên: "Asîmîlasyon û tevkujiyên Kemalîst û şovenîstên Tirk li Bakurê Kurdistanê" ji me re diaxivî. Li ser tevkujiya Dêrsimê, serhildana Seyid Riza, awayê şehîdkirina Elîşêr û Zerîfê, xiyaneta Rayber û mijarên din cara yekê bû ku em bi rêya wî haydarî rewşa tirajîk a jiyana Kurdên bakur dibûn. Piştre, wî ew mijar di kovara Serxwebûn yan jî Berxwedanê da weşandin. Min hingî zanî ku Sefkan destê nivîskariyê jî heye.



### Mizgîniya hebûna Hunerkomê

Mizgîniya herî mezin ku Sefkan dida me çêbûna Hunerkomê bû. Wêneyên wî tevî hunermenda şehîd Mizgîn, Zozan û hinek hevalên din, daxûyaniya çêbûna Hunerkomê û logoya wê di berîka wî de bûn. Ne tenê sazbend û dengxweş bû, belkî di karê şêwekariyê de jî heya radeyeke baş hosta bû. Xwedî îde û ramanên hunerî-siyasî bû. Bi wan zanînên kûr jî roj ji roja din zêdetir, dixwest pêngavên mezintir bavêje. Logoya watedar a Hunerkomê wî bixwe kişandibû û sembolên li ser, ji me re îzah dikirin. Bi ser hev de şehîd Sefkan hunermendekî xwedî plan û projên domdirêj bû. Ez bawer dikim, ger ew nehata şehîdkirin, rewşa hunerê me yê protestoyê wê gihiştbûya asteke bilindtir û dewlemendtir. Payîza sala 1984'an ew çû çiyayên Kurdistanê û hezar mixabin şehîd bû. Ew û bîranînên pê re heya roja îro jî di dil û hestên min de zindî ne.

### Çi ji defteran hat?

Ew 4-5 defterên ku ji dengê hunermendên dengbêj hatine nivîsîn û tijekirin, tevî wan kasetan, min û Sefkan li postxaneya bajarê Urmiyê şandin welatê Elmanyayê. Weke bê bîra min, di dawiya navnîşanê de navê bajarê Bonnê hebû. Hingî hinartina tiştên wiha ji Kurdistanê ber bi Ewrûpayê ve gelek bi zehmet bû, lê me bi dayîna hinek pereyê zêde me karmendê postê razî kir ku mohra metbûatî (ragehandinê) li ser paketê dida û êdî bêkontrol dihatin postkirin. Niha pirsa min ji endamên Koma Berxwedan û Hunerkomê ev e: Ew arşîva zêrîn li ku ye? Di kîjan saziyê de hatiye parastin? Piştî ez hatim Ewrûpayê, min pirr pirsî ku wê arşîvê peyda bikin û em karekî li ser bikin, lê hezaran car mixabin, kes nebû hevkar. Pêre jî min zanî ku qîmeta arşîvê li ba berpirsyarên hunerî di rêza herî dawiyê de ye. Heya roja îro jî arşîveke wan a bi ser û ber tine. Ez gelek li ber Amele geriyam ku li ser kar û xebatên wî yên hunerî û arşîvkariyê bernameyeke Navdarên Kurd çêkim, lê wî wisa texmîn dikir ku ez ê arşîva wî talan bikim yan jî ji xwe re bi kar bînim! Wî qet xwe neda ber erkeke wiha, lê ez nizanim, ger wî arşîveke salên xebatên Hunerkom û Koma Berxwedanê heye, yê bi xwe re bibe ku derê?!

### Bi qedrê arşîvê nayê zanîn

Pêwîst e vê rastiyê bibêjim ku hevalê Xelîlê Mêrdînê, hinek wêneyên dîrokî dane min ku di arşîva min de li ser navê wî tomarkirî ne. Yên ku bihayê karekî wiha dizanîn hunermend Medan Zirav û Hozan Şemdîn bûn ku ji Rojavayê Kurdistan û Ermenistanê arşîveke mezin bi xwe re anîbûn Akademiya Kurdî a li bajarê Neussê, lê îro jî kes nizane çi bi wan hemû kasetên tije berhemên dîrokî, destan, çîrok, qesîde, şanoname û dîmenên dîrokî hat!

Şehîd Sefkan kesekî giran û qedirnas bû. Hingî wî bi rêbazên dûrbînane hem dengê dengbêja tomar dikir, hem navê kesên hevkar di dawiya her stranê de dinivîsî, hem jî li pey nivîsîna kilamên dûr û dirêj, bi zimanê Tirkî kurtiya wateya wan jî dinivîsî. Çavkanî û cihê rûdana stranê jî bi baldarî dinivîsî. Carna jî bi kenekî pirr sirûştî digot: "Zanî me îro mîrateke çiqas bihagiran ji mirinê rizgar kir. Êdî ev kete nava dilê arşîva me û dema ez vegerîm Ewrûpayê, em ê li ser van berhemên dîrokî karekî mezin bikin. Spas hevalo ji te û hevalê Ehmed re. Ev dengbêj û mirovên kal xizîneya huner û zimanê me yê dewlemend in. Qet û qet nabe bêne piştguhkirin û jibîrkirin. Dîroka Kurd û Kurdistanê di sînga wan de veşartiye..., mejiyê wan arşîveke tije gencîne û xizîne ye... qet ji wana dûr nekevin..."

Qet ji bîra min naçe dema ku bi qasî sê rojan dengbêjê nemir, Bêmalê Rajanê destana Kela Dim-Dim ji me re digot, carna Sefkan pê re hêsir dibarandin. Çavên wî tije dibûn û kesên derdora me matmayî diman! Kela Dim-Dim û berxwedana wê gelekî bala wî kişadibû û herdem digot: "Gelo rojek yê were ku ev berxwedan û destana rastîn bibe filmekî sînemayî û em wê bibînin yan ne? Mîrê Kurdan Emîrxanê Lepzêrîn qehremanekî nesankirî û rêberekî doza me ye." Apê Bêmal carekê jê re got, "Emîrxanê Lepzêrîn jî weke te bejin bilind û xweşik bûye, ger ew film çêbibe tu li cihê wî bilîze..." Û Sefkan bi hesreteke mezin jê re got, "Xwezî bi wê rojê Apê Bêmal....".

Hesereta min jî ew e ka ew wêne, dengên tomarkirî, stranên ku bi destxetê Sefkanê xemxûrê çanda Kurdistanê hatibûn nivîsandin, niha li ku derê ne? Di bin toz û qerêja kîjan gemarê de wenda bûne û kengî yê bigihîjin destê min ku tevan weke pirtûk û li ser navê hunermendê şehîd Sefkanê heval, belav bikim?! Xwezila bi wê rojê ka kengî yê bê!

# Çend hûrgilî li ser
# Koma Berxwedana



**Tevî ku bi dehan sal derbas bûne, dema ku Koma Berxwedan derdikeve ser dikê, her kes bi hestiyarî lê guhdarî dike. Ji ber ku Koma Berxwedan di muzîkê de dengê şoreşê ye. Kom kete rûpelên menewî yên dîroka muzîka Kurdî, bû dibistanek.**

Firaz BARAN

Koma Berxwedan sembola muzîka siyasî ya Kurdî ye. Kom, di navbera 1983 û 1999'an de çalak bû. Di vê nivîsê de ez ê van 17 salan binirxînim bi wê yekê ku ez ê çend pirsan bipirsim û li bersivên wan bigerim:

### Navê komê ji ku tê?

Koma Berxwedan di sala 1983'an de hat damezrandin. Navê xwe ji slogana Mazlûm Doxan "Berxwedan Jiyan e" girtiye. Endamê Komîteya Navendî ya PKK'yê Mazlûm Doxan di sala 1980'yî de li hepsa Diyarbekirê pirtûka bi navê "Berxwedan Jiyan e" nivîsand. Ev pirtûk di Nîsana 1981'ê de hatiye çapkirin. Di sala 1982'yan de, Mazlûm Dogan li zindanê, roja Newrozê çalakiyeke fedaî kir. Şehadeta wî bandoreke mezin li tevahiya pêkhateya PKK'yê û civaka Kurdistanê kir, helbet her wisa li hunermendên Kurd jî... Ji ber vê yekê hunermendên Kurd dema ku dixwazin di sala 1983'yan de komeke muzîkê ava bikin, navê xwe dikin "Koma Berxwedan".

### Koma Berxwedan li ku hat damezrandin?

Koma Berxwedan li bajarê Kolnê (Elmanya) hate damezrandin. Koln ji bo Kurdan bajarekî giring e. Em dikarin sedema vê yekê wiha rave bikin: Piştî têkçûna 1975'an yekemîn saziya dîplomatîk a ji aliyê Kurdan ve hate vekirin, Komîteya Amedê bû ku di sala 1981'ê de li Koln Hansaringê hatiye damezirandin. Rojnameya Serxwebûnê di sala 1982'yan de li Koln Ebertplatzê dest bi weşanê kir. Hunerkom di sala 1983'yan de hat damezrandin û li Kolnê Ebertplatz dest bi xebatên xwe kir. Koma Berxwedan bû koma sereke ya Hunerkomê.

Ev 40 sal in herî zêde weşanxaneyên şoreşa Kurdistanê pirtûkan çap dikin. Depoya yekemîn a Weşanxaneya Serxwebûnê li Koln Neusser Strasse ye. Balkêş e ku ev çar sazî pirr nêzî hev in. Di navbera wan de herî zêde 200 metre hene. Ji ber vê yekê, Ebertplatz ji bo welatparêzên salên 80'yî xwedî cihekî manewî ye.

Dîsa yekemîn greva birçîbûnê ya Kurdên li Elmanyayê sala 1981'ê li Kolnê hat lidarxistin. Li meydana vekirî bi qasî hefteyekê dewam kir û êşkenceyên dewleta Tirk ên li zindanan ji raya giştî ya Elman re hatin vegotin. Ev çalakî bi pêşengiya hunermendên Kurd Şivan Perwer, Seyîdxan, Amele û Muarrem Aral hat lidarxistin.



### Koma Berxwedan çend kaset derxistin? Navên wan çi ye û kîjan salê derketine?

Koma Berxwedan, di navbera salên 1983-1995'an de 16 kaset derxistin. Navên kasetan ev in:

| | | |
|---|---|---|
| Koma Berxwedan | 1983 | Weşanên Hunerkom |
| Berxwedan Jiyane | 1984 | Weşanên Hunerkom |
| Dîlan | 1985 | Weşanên Hunerkom |
| Welat Gula Cîhanê | 1987 | Weşanên Hunerkom |
| Kaniya Welat | 1987 | Weşanên Hunerkom |
| Botan | 1987 | Weşanên Hunerkom |
| Peşmerge | 1988 | Weşanên Hunerkom |
| Kulîlken Newrozê | 1989 | Weşanên Hunerkom |
| Şad Bibe Welatê Min | 1990 | Weşanên Hunerkom |
| Amed | 1991 | Weşanên Hunerkom |
| Meşa Azadi | 1992 | Weşanên Hunerkom |
| 15ê Tebaxê | 1993 | Weşanên Hunerkom |
| Klamên Klasîk | 1994 | Weşanên Hunerkom |
| Klamên Bijartî | 1995 | Weşanên Hunerkom |

Koma Berxwedan Bi Mêvanên Xwe Re Dibejê - Weşanên Hunerkom

### Endamên Koma Berxwedan kî bûn?

Damezrênerên Koma Berxwedanê ev in: [Şehîd] Sefkan, [Şehîd] Mizgîn, Seyîdxan, [Şehîd] Çiya, Zozan, Xemgîn Bîrhat, Zinar û Serdar.

Hunermendên ku beriya sala 1990'î tevlî komê bûne ev in: Xelîl Xemgîn (1986), Şemdîn (1988), Cemal Tîrêj (1988), Azad (1989), Diyar (1989), Hekîm Sefkan (1990), Peywan Arjîn (1990), Alî Îkîzer (1990), Eylem (1990), Armanc (Ji Efrînê ye, strana ARGK'yê gotibû), Burhan, Guler, Fikret, Şiyar Munzur, Xalid û Turkan Îpek.

Hunermendên ku piştî sala 1990î tevlî komê bûne ev in: [Şehîd] Serhad, Beser Şahîn, Merdan Zirav, Cevad Merwanî, Cafer, Binewş, Yasîn Poyraz, Hêlîn, Mehmet Yapiştiran, Memo Gul, Zarife.

### Koma Berxwedanê li ser kîjan mijaran stran çêkirine?

Koma Berxwedan bû dengê muzîkê yê tevgera azadiya Kurdistanê. Şîna şehîdan girt, berxwedana gel, gerîla û têkoşerên zindanan anî ziman. Sirûdên ku moral dida gel çêkirin. Weke mînak: Rêheval Egîd, Hey Şoreşgerên Kurdistan, 15'ê Tebaxê, Pêşmergeyên Qehreman... Komê, stranên gelêrî jî wekî çandeke qedîm a gelê me qebûl kir û ji nû ve xwend.

### Şehîdên Koma Berxwedanê kî ne?

**Sefkan (Celal Ercan):** Di 16'ê Nîsana 1985'an de li Başûrê Kurdistanê şehîd bû.

**Mizgîn (Gurbet Aydın):** Di 11'ê Gulana 1992'yan de li Tetwanê şehîd bû.

**Çiya (Gazi Sayan):** Di 16'ê Gulana 1997'an de li Hewlêrê şehîd bû.

**Serhad (Suleyman Alpdogan):** Di 22'ê Tirmeha 1999'an de li deşta Ferașînê ya Bêşebabê şehîd bû.

### Hin taybetmendiyên endamên komê?

**Kasetên Solo:** Endamên komê zêdetirî 60 kasetên solo derxistine û bûne nûnerên giring ên muzîka Kurdî. Endamên ku kasetên solo derxistine ev in:

Şehîd Sefkan, Şehîd Mizgîn, Şehîd Çiya, Şehîd Serhad, Beser Şahîn, Binevş, Cemal Tîrêj, Cewad Merwanî, Diyar, Eylem, Hekîm Sefkan, Peywan Arjîn, Serdar, Seyîdxan, Şemdîn, Şiyar Munzur, Xelîl Xemgîn, Xemgîn Bîrhat, Zarîfe û Zozan.

**Hekîm Sefkan:** Di muzîka Kurdî de, bi taybetî jî di navbera salên 1988-1999an de, stranên ku bi navûdeng bûne, herî zêde Hekîm Sefkan nivîsandine: 15ê Tebaxê, Ez Şehîd im, Rojbaş Gerîla, Sînor, Rêya Serxwebûnê û bi dehan stranên din.

**Şemdîn:** 20 salan (1998-2018) li ser dengbêjiyê bernameyên televîzyonê amade kirin. Wî, çanda dengbêjiyê populer kir û her kesî qebûl kir ka çanda dengbêjiyê çiqas giring e. 800 dengbêj tevlî bernameyên Şemdîn bûne û bi vî awayî arşîveke giring a neteweyî ava kiriye.

**Cewad Merwanî:** Stranên Radyoya Yêrîwanê, Radyoya Bexdayê û stranên dengbêjên Bakûrê Kurdistanê jî tê de bi giştî şeş hezar stran, bi alîkariya hevalên xwe yên di nava komê de û hin kesên din berhev kirine.

**Xelîl Xemgîn:** Bi stranên xwe yên bi navê Hemzeyê Pehlewan, Nûrî Dersimî, Berxwedana Sasonê, Hogir, Bagok, Hey Çemo, Rista Şehîd bû dengê şehîdan.

### Taybetmendiyê muzîkjenên komê çi ne?

**Êqbal Hacibî:** Ligel aranjekirina kasetên ku komê di sala 1992'yan de derxistine orkestraya senfoniyê jî ava dike. Vê orkestrayê wan salan bandoreke giring çêkiriye û li gelek cihan derketiye ser dikê.

**Memo Gul:** Amûra wî ya muzîkê ney e. Dîsa li amûrên wekî bilûr, tenbûr, ûd, cumbuş, dahol, bendîr, rîtim û piyanoyê jî dixe. Bi giştî di qederê sed kasetan de wek aranjor û muzîkjen cih girtiye.

**Yasîn Poyraz:** Pisporê reqsên gelêrî ye û muzîkjenekî taybet e. Die qederê sed kasetên kurdî de muzîkjenî kiriye. Li 25 amûrên pifdanê û herî zêde jî li bilûra lal dixe.

**Merdan Zirav:** Ew wekî aranjor xwedî pozîsyoneke taybet e. Hunermend ji bo Merdan Zirav wiha dibêjin: "Em straneкê dinivîsin û muzîka wê çêdikin. Merdan dixemilîne û naverokeke dewlemend derdixîne." Mînak kasetên Koma Amed (salên 90î) û kaseta Beser Şahîn a bi navê Roj wî aranje kirine.

### Ez ji bo Koma Berxwedan li çi difikirim?

Li gorî min Koma Berxwedanê di salên 1983-1995'an de bi rista xwe rabû. Kete rûpelên menewî yên dîroka muzîka Kurdî. Kom, bû dibistanek. ew her wiha bû keleha muzîka şoreşa Kurdistanê.

Piştî sala 1995'an endamên komê li ser karên xwe yên solo sekinîn. Tenê di şevên neteweyî yên wekî 21'ê Adarê, 15'ê Tebaxê û 27'ê Mijdarê de bi navê Koma Berxwedan derketin ser dikê. Tevî ku bi dehan sal derbas bûne, dema ku Koma Berxwedan derdikeve ser dikê, her kes bi hestiyarî lê guhdarî dike. Ji ber ku Koma Berxwedan di muzîkê de dengê şoreşê ye. Em hezar carî malavahiya Koma Berxwedanê dikin ku bû dengê menewiyata me.

* Firaz Baran, nivîskarê pirtûka "Hunerkom Akademî Mîr 1978-2006" e.

## Cudatiya muzîka Koma Berxwedanê

# Hişyariyeke bi rêya muzîkê

◗ Em carna dibêjin qey Kurdistan jî xeyal e, weke van metaforan, lê dîsa bi Koma Berxwedanê em fêm dikin ku ew rastiya me ya herî mezin e. Û ne hevî ne jî xeyal e; wê rojekê ava bibe helbet.

◗ Ez fedîkar im ku min berê bi qedrê wan qenc nizanîbû ji ber ku asîmîlasyona çandî, kesên wekî min jî carna manîpûle dike û dihêle ku giyayê hewşa me bi me tehl be.






Mustafa DEMİR

Navê Koma Berxwedanê û dema ku wan dest bi muzîkê kiriye, wekîtina nivîsê ya berî 3000 salî giring e. Di wan demên ku wan stranên Kurdî di studyoyeke bin erdê de çedikirin, Kurdî jî Kurd jî di çaleke kor de bûn. Hew dizanîn ka kî ne. Stranên Koma Berxwedanê ne tenê bû şewqa di şikeftê de, ew bû agirê li çiyayê Bagokê û bû hilma raperînê li Hezexê.

Koma Berxwedan û stranên xwe bûn yeqîniya xortekî şivan li Qersê ku wexta ji ber pez vegerî dihat malê, di nav livînan de bi wan stranan diket xewê û dîsa bi wê re hêdî hêdî şiyar dibû. Koma Berxwedan li Dêrsimê piştî tirsa heftê salî ku hestûyê meriv dilerizîne, dengê bêrîvaneke 16 salî ye li zozanan. Koma Berxwedan li Helebceyê, heyfa pêncî hezar zarokan e.

### Ne tenê komeke muzîkê bû

Mirov dikare bi rojan ji aliyekî edebî û felsefî ve Koma Berxwedan û muzîka wê şirove bike, lê ew jî têrî nake. Sedema ku Koma Berxwedan ne tenê komeke muzîkê bû, ew bi xwe serhildanek, şiyarbûnek e. Lê ez ê vê nivîsê li ser muzîka Berxwedan û cudabûna wê binivîsim.

Koma Berxwedanê dema dest bi muzîkê kir, muzîka Kurdî, komel û saziyên Kurdî li welat jî li Tirkiyeyê jî qedexe bûn, loma wan karên xwe li sirgûnê, li Ewrûpayê kirin. Û derfetên albûmên wan carna ji binî ve tine bûn. Li nav ewqas zehmetî û bêderfetiyan, wan her carê berhemên têr û tije qeyd dikirin û digehandin gel. Di albûmên wan de carna tenê tembûr û defek, carna orkestrayeke piçûk û carna jî keyboardek tenê hebû, lê wan bi van derfetan jî her çar aliyê welatî bi muzîka xwe hembêz dikir û ew digihîştin her mala li çiyayekê Kurdistanê.



### Bêyî stranên Koma Berxwedanê bername çênedibûn

Di albûmên wan de muzîka Kurdî ne tenê ji heremekê bû, albûmên wan ji melodî û serpêhatiyên ji her çar aliyê welat pêk dihatin. Bi sedan stranên Kurdî ên di bin rîska windabûnêde bûn, wan bi lekolînên xwe û bi dengekî nû, ji nû ve çap kirin. Muzîkjenên Kurd ku bi muzîka Kurdî mijûl dibûn bêyî stranên Koma Berxwedanê nikarîbûn nîv saetê bernameyekê bidomînin. Ev berî 30 salan jî û îro jî wilo ye. Ev hem mezinbûna Koma Berxwedanê ye, lê belê di heman demê de kêmasiya wan muzîkjenên nû ye jî. Hunermendek bi cover yan jî stranên gelêrî yên Kurdî dikare cihekî ji xwe re bibînê di nava civakê de lê nikarê wî cihî demeke dirêj bidomîne.

### Bi berhemên wan Kurdistan mezintir dibû

Di berhemên Koma Berxwedanê de tişta herî balkêş nêzîkbûna Kurdistanê ye: Kurdistan di her berhema wan de mezintir dibe. Berê gundekî Merdînê bû Kurdistan lê bi dengê Koma Berxwedanê, Kurdistan carna bû keziyên keçeke xama ya li zozaneke li Meletiyê, carna bû bêhna kulîlkekê li Behdînanê, carna bû çirayek li ber çemê Mûnzirê, carna bû xezalek li Bagokê, carna jî li Mehabadê bû kevokek. Ew Kurdistana wilo piçûk, veguherî jiyana me. Em carna dibêjin qey Kurdistan jî xeyal e, weke van metaforan, lê dîsa bi Koma Berxwedan em fêm dikin ku ew rastiya me ya herî mezin e. Û ne hevî ne jî xeyal e; wê rojekê ava bibe helbet.

### Giyayê hewşê tehl e

Koma Berxwedan li Rojhilata Navîn weke koma yekem e ku muzîka şoreşger bi vê astê û ewqas dûvdirêj çêkiriye. Stranbêj û komên piçûk di wan deman de li nav Tirkan, Farsan, Ereban hene, lê bi vê astê ne tevgeriyane ne jî piştî albûmek an jî du albûman êdî berhem çênekirine yan jî ji aliyên wan dewletan ve hatine qedexekirin û xebatên xwe nedomandine. Di vê rastiyê de wê piştî gelek salan dema behsa dîroka muzîka kurdî hat kirin, dê were gotin ku komeke wilo berxwedêr û şoreşger a hunermendên Kurdistanê hebûye û bi dehan salan bi sedan kesan karên xwe tê de dewam kiriye.

Koma Berxwedanê heya niha 13 albûm çekirine û li ser medyaya civakî û di arşîvan de qederê 300 stranên wan hene. Dema ku min dest bi vê nivîsê kir yek bi yek min li stranên wan ên ku min peyde kirin hemûyan guhdarî kir. Ez fedîkar im ku min berê bi qedrê wan qenc nizanîbû, ji ber ku asîmilasyona çandî, kesên wekî min jî carna manîpûle dike û dihêle ku giyayê hewşa me bi me tehl be.

Bi riya vê nivîsê ez bejna xwe li ber keda hemû endam û xebatkarên Koma Berwedanê ditewînim ku mal û canê xwe di ber vî zimanî de dane û hevî dikim Koma Berxwedan bi nifşên nû yên keç û xortên me 100 salên din jî li ser piyan bimînê.

# Koma Berxwedan: Suflora Şoreşê




**Koma Berxwedan di warê muzîka Kurdî ya modern de belkî jî koma yekemîn bû ku me zarokên salên 1990î lê guhdarî dikir. Koma yekemîn bû dengê wê ji bajaran ber bi çiyayan ve olan dida. Koma Berxwedan ji bo nifşê me ku di serê salên hêştêyî de hatibû dinê suflora şorêşê bû.**

**Herwiha dengê Koma Berxwedan wekî nasînê bû. Nasîna erdnîgariyê, nasinê miletê xwe. Cara ewil Botan û herêma Botanê me bi wê nas dikir. Ji Botanê em digihan Geliyê Zilan. Koma Berxwedan ji bo me cîhaneke nû bû. Em li Kurdistanê digerandin.**

Zerdeşt OMERÎ

Di salên 1990'an de heke hûn li gundekî çiyê yê Kurdistanê mezin bûbin, teqez stranên bicoş û kelecan yên şoreşê bi ber guhê we ketine. Ew stranên ku nedişibiyan stranên Kurdî yên di radyoyê de ku ji ber xuşe xuşê geh dihat bihîstîn geh bêdeng dima. Sal 1989 nebû bawer dikim. Gerîlayên PKK'yê êdî li gelek deveran xwe nîşan didan û bi gel re têkiliyên germ datanîn.

Li gundê me jî, heman pêvajo li dar bû. Ew kesên ku xelkê bi kurtepist behsa wan dikir û zarokên xwe tembîh dikirin ku behsa wan ji kesî re nekin, hêdî hêdî dibûn "hevalên" nêzîk. Li gundê çiyê yên bêceyran ku çûna bajêr bi saetan diajot, hatina hevalan nîmetek bû. Lewra ew rêyeke têkilîdanîna bi gund bajaran re bûn. Herwiha exbarên radyoyaya bêpîl mayî û naxebite wan dianîn û belav dikirin. Lê wan çawa wezîfeya radyoyê hilgirtibû jî, bo teybên me jî wezîfeyeke nû anîbûn. Bantên ku wan bi xwe re dianîn êdî me di teybên xwe de guhdar dikirin. Bantên ku ji ber teybên piçûk yên karê rojnamegeriyê hatibûn zêdekirin, hinekî ji bantên dengbêjan ku li odeyan hatibûn dagirtin biqelîtetir bûn.

Bantên ku bi şev û dihatin û heya derengê şevê li wan dihat guhdarkirin, bi hevalan re careke din diçûn. Vê yekê wisa çend mehekî berdewam kir. Paşê nizanim çawa çêbû lê ew kaset êdî bi roj jî li malê man. Lê vê carê jî meseleya me û pîlan hebû. Dema pîl biqediya têkiliya me û dinyayê jî diqediya. Wê demê divê em hemû kom bibûna da ku em li dengê nû guhdar bikin. Belê em zarok bûn lê kelecana guhdarîkirina tiştên nû jî ecêb bû. Nexasım guhdarîkirin û jiberkirina van stranên hêsan gelekî kêfa me zarokan dianî û herwiha ji bo cihê pesnê bû, bê kî gelek stranan ji ber dike. Li gund strana sereke jî "Bijî Bijî Heval Egîd" bû. Helbet wê demê me nedizanî ev stran ya Koma Berxwedanê ye. Me tenê navê solîstê, Mizgînê dizanî û hemû bant jî li ser navê wê dihat hesêbê. Lê tiştekî ecêb hebû. Di bantê de dengê zilaman jî hebû. Bi aqilê zaroktiyê me tu tiştek ji vê yekê fêhm nedikir. Lê stran gelekî rîtmîk û jiberkirina wan hêsan bû.

### Mizgîniya serfiraziyê û şîna şehîdan

*"Bijî bijî heval Egîd, bijî bijî şêrê Kurda*
*Bijî bijî pilingê çiya, bijî bijî serleşkerê hêja"*

Her çi qasî me wateyan gelek peyvan nedizanî jî stran bi me gelek xweş dihat û jiberkirina wan ji wan stranên ku heya wê rojê me guhdar kiribûn hêsantir bû. Ev stran tim û dayim li ser zimanê me bûn, geh bi gotin, geh bi fîkînê. Herwiha me Rêheval Mahsûm nas kiribû bi rêya vê stranê. Em bibûn hevalên hevûdu. Lê tişta ecêb jî ew bû ku du navên wî hebûn. Ew hem Mahsûm bû hem jî Egîd. Ji ber wê kaseta Koma Berxwedanê ku paşê hîn bûm ku navê wê Botan e, saleke me wisa di nav wê sergêjiyê de derbas bû. Piştî wê hevalekî ku li tembûrê dida dihat û diçû. Wî ji me re qala Koma Berxwedanê kiribû. Em êdî nû pê hesiyabûn ku di bantekê de gelek kes dikarin bistrên. Herwiha em fêrî navê Xelîl Xemgîn û dengê wî jî bûbûn.

Koma Berxwedan êdî ji bo me jî şîfreyek bû. Ji bo me yên ku li Koma Berxwedan guhdar dikirin hebûn û yên ku guhdar nedikirin. Lewra ew dengê wê şorêşê bû ku her roja diçû bi heybet nêzîk dibû. Dengê Kurdistaneke azad bû. Mizgîniya dahatûya serfiraz bû. Dengê şîna li pey çûyîyan bû lê ne şingirêdaneke ji heznê, şîneke di rengê tolhilanînê de bû. Hêvî bû. Berî her tiştî ew stranên geşkirina hêviya dilê me zarokan bû. Xwequrekirina me ya zaroktiyê bû bê dengê kê ji me nêzî meqamê stranê bibe.

Herwiha dengê Koma Berxwedan wekî nasînê bû. Nasîna erdnîgariyê, nasinê miletê xwe. Cara ewil Botan û herêma Botanê me bi wê nas dikir.

### Em li kurdistanê digerandin

*"Ey Botan Botan, Botan e, şerê me li ser te giran e."*

Erê şerê me li ser Botanê giran bû. Şêrên me li wê derê jî şêr dikirin û Botana biheybet me dizanîbû ku li pişta me ye. Lewra li pişta wan çiyayên tenya, me xwe bi tenê hîs nedikir.

Ji ber zilm û zora stemkaran em bi hezaran salan birîndar bûn. Lê em nû pê dihesiyan. Carinan mezinên me jî behs dikirin. Bi her behskirinê re em fêr bûn. Ji Botanê em digihan Geliyê Zilan. Em fêrî navên nû dibûn. Koma Berxwedan ji bo me cîhaneke nû bû. Em li Kurdistanê digerandin. Em fêrî peyvên nû dikirin. Baş tê bîra min carinan di nav mezinan de nîqaşên li ser wateya peyvan çêdibûn. Peyva ku nedihate çareserkirin dima bi hêviya hevalan re.

### Empatiya bi dayikên şehîdan re

*"Lê dayê bes e menal e, lê dayê bes e menal e, nalîn ji me re ne derman e"* digotin û li ber dilê dayikan digeriyan. Ew strana aram a bêdengiya dayikan bû. Dayikên me herî zêde li wê stranê guhdar dikirin, baş tê bîra min. Ev rêya empatîyê bû bi dayikên hevalan re û carinan jî hêstirên ku kesî nedidîtin. Lê dîsa jî hêvî hebû bi qasî Botanê, bi qasî Cûdî.

Koma Berxwedan di warê muzîka Kurdî ya modern de belkî jî koma yekemîn bû ku me zarokên salên 1990'î lê guhdarî dikir. Koma yekemîn bû dengê wê ji bajaran ber bi çiyayan ve olan dida û heya bi gundê gelekî dûrî bajêr yên li serê çiya jî berbelav dibû. Koma Berxwedan ji bo nifşê me ku di serê salên hêştêyî de hatibû dinê suflora şorêşê bû.



...
Va bilbil dike fixan
Mizgîn dike hevalan
Pîroz dike cejna wan
sed her bijîn
Kurdistan.

*Şehîd Elî Temel*

**Wêne: Hogir Ar**